rupel 1+.qxp_Layout 1 4.09.2020 20:37 Page 1



Têkoşîna li dijî tecawizê...

Ew ê hîn pir tişt bên gotin. Divê bê gotin jî. Kes bêdeng nemîne. Dê rojnamevan li gorî rengê xwe/sekna xwe mijarê bigirin dest, dozger li gorî pergala xwe, malbat li gorî hişmendiya xwe, civat li gorî têgihîştina xwe, heta faîl jî li gorî xwe... *Munewer Azîzoglu Bazan / R.2*



Têkilîya bîr û çandê

Bi salan civaknas qala 'bîrê' bi taybetî ji bo kesan kirine lê belê piştî xebatên Maurice Halbwachs bîr bi civakê re hatîye nasîn...
Ger em bixwazin 'bîra çandî' yan jî ji zargotinê fêm bikin divê em 'bîra civakî' binasin...

Nesîbe Guneylî / RÛPEL- 8



Ber dikanê...

Em hemû qîzên xama ne, kelekela me ye, pirtepirta dilê me ye. Her yek ji me di dilê wê de şêrek veşartî heye. Îca ne bi xêr, di nav malên me de ne kanî hene, ne jî çemek dikişe. Kanîya herî nêzîk saetek e...

Kewê Redkan / R. 10

Rojnameya Heftane

xwebûn

7-13 Îlon 2020
Hejmar: 38
Buha: 4 TL

www.xwebun.org

rojname@xwebun.org

Bêyî Pêjna te û Berfwerîn

Du pirtûkên helbestan ên nû li pirtûkxaneya kurdî zede bûn. Weşanxaneya Belkiyê pirtûka Rizoyê Xerzî ya Bêyî Pêjna Te û pirtûka Rênas Jiyan Berfwerîn çap kirin. Pirtûka helbestan Bêyî Pêjna Te berhema Rizoyê Xerzî ya sêyemîn e. Pirtûk 96 rûpel e û di pirtûkê de derdora heftê helbest hene lê mirov dikare wiha jî bêje ku helbesteke ji heftê beşan pêk tê, ji ber ku tev bi sernavê Bêyî Te hatine nivîsîn...

RÛPEL-11

Guherîna bi demê re!

Di dîrokê de, dem û dewran, sal û zeman bûne mijar ji dengbêj, çîrokbêj, rewşenbîr, ronakbîr û wêjevanan re. Di ew civata geriyayî de yan li ber agirê tifikê yan jî li ber çira û lembaya bi don û gazê pêketî guhdariya gotina ji devê kesê ku dipeyive hatiye kirin. Hebe pirs û nebe jî fêm hebûye bi erêkirinê re ku ser diheje. Rêzgirtin û hurmet ji hevdu re hebûye... ***Rohat Kurêşî /R.11***

Qirkerdişê cinîyan

Tirkîye de hetê dewlet û camerdan de şerêko bêhempa serê cinîyan de dest pekerdo û roj bi roje hîna zêdetir berdevam keno. Polîtîkayêko taybet her cayê Tirkîye de serê cinîyan de yeno ramitene. Cinî her roja bîne bi destê camerdan şîddet û zilm vînenê, yene tacizkerdiş, tecawizkerdiş û kiştiş. Ganî derheqê çîyo ke serê ma cinîyan de qewimîyenê, tespiteko net bero kerdiş...

Semra Turan / RÛPEL - 9

Divê CPT û DMME bi erka xwe rabin

Metirsiya Kovîd-19'ê ya li girtîgehan, mafê darzandina adilane û parastinê, tecrîd û binpêkirina mafên li girtîgehan di rojevê de ne. Li aliyekî piraniya civakê li benda çareserkirina van pirsgirêkan e, li aliyê din ev pirsgirêk her diçe dijwartir dibin. Rêveberê MED TUHAD-FED 'ê û endamê komîsyona girtîgehan a Komeleya Hiqûqnasên ji bo Azadiyê parêzer Yûsûf Çakas rewşa li girtîgehan nirxand. Çakas destnîşan kir ku rewşa girtî û hukumuxwaran pirsgirêka giştî ya civakê ye, divê ev pirsgirêk bên çareserkirin. Çakas dibêje pêwîst e saziyên navneteweyî li ser van meseleyan bisekinin... ***Hevpeyvîna Felat Niştiman - R.4***



Amedê dabeş dikin!



Bajarê Amedê ku li ber dilê kurdan gelek şîrîn e û weke paytexta Kurdistanê tê qebûlkirin, ji bo rantê û polîtîkayên ewlehiyê di hedefa dewlet û hikûmetê de ye. Piştî rûxandina Sûrê niha jî tê armanckirin ku Amed bi tevahî bê dabeşkirin û bi hêsanî bê kontrolkirin... Di bin navê nûkirina rêya trênê ya di nav Amedê re derbas dibe de, dixwazin bi dîwarekî bi qasî 2 metreyan bilind navenda Amedê dabeş bikin... ***RÛPEL - 3***



Ristemê Zal kî ye?

Demsala zivistanê ji bo gundiyan dibû destpêkek nû. Di şevên zivistanê yên dirêj de, dihatin cem hev û heta derengiya şevê bi qerf û henekan, dem derbas dikirin. Gundî jî di van şevên dirêj de hema hema her şev li malekê kom dibûn.. ***Mem Farqînî /R -5***

Qebûlkirina statuya Şengalê yan..!

Dema navê Şengalê tê gotin, trajediya mezin, Fermana 73'an a di serê civaka êzidî de pêk hatî tê bîra mirov... Her kes vê rastiyê baş dizane. Ji bo ku ev civak ji aliyê feraseteke serdest û derveyî dihat birêvebirin bi komkujiyan re rû bi rû ma... Ji bo wê yekane rêya ku ev statuya li Şengalê bi pêş ketî mayînde bibe, hevgirtin û tifaqa pêkhateyên herêmê û bi taybetî jî ya civaka êzidî bi xwe ye... ***Mem Avba / R - 6***

Felemez Ulug
PKK hincet e
Rûpel - 7

Cemîl Oguz
Licey de çirê dewicî jobînan kişenê?
Rûpel - 9

Egit Yazar
Embara bokên kurdan; Kela Rebetê
Rûpel - 12

rupel 2++.qxp_Layout 1 4.09.2020 20:13 Page 1

Qad û dem cuda bûn lê armanca wan yek bû

Navenda Nûçeyan

Di nav civakan de her çiqas zanist, teknolojî, muhendîsî, matematîk, siyaset, fîlozofî û hwd. wek qadên mêran bên dîtin jî di dîrokê de gelek jin hene ku di van qadan de navên xwe bi tîpên zêrîn nivîsandine.

Di wekî her qadên jiyanê di van qadan de jî jin li dijî zîhniyeta mêr ku jinan an bi temamî nedidîtin an jî kêmê xwe dîdîtin li ber xwe dan û bi têkoşîna xwe ji jinên piştî xwe re bûn mînak.

Em dikarin bi çend mînakan behsa jinên ku bi xebatên xwe derbasî dîrokê bûne bidin.

Programkara kompîturê


Ada Lovelace ku di sala 1815'an de li paytexta Îngilistan Londonê hat dinê û navê wê yê rastîn Augusta Ada Byron e, li cîhanê yekemîn programkara kompîturê tê zanîn.

Lovelace li Zanîngeha Cambridgeyê bi profesorê navdar ê matematîkê Charles Babbage re di qadên matematîk û mantiqê de gelek xebatên girîng kirine û bi serkeftina xwe ya di qada matematîkê de bala mamosteyê xwe kişandiye.

Lovelace di sala 1842-1843'yan de makeleya Luigi Menabrea yê muhendîsê artêşa Îtalyayê bû ku li ser motoran nivîsandibû, bi zêdekirina zanînê xwe werger kir. Ev zanînên wê ku wek yekemîn bernameya kompîturê tê pênasekirin, yekemîn algorîtmaya ku dê ji aliyê makîneyan ve bê dîzaynkirin dihewand. Xebat û nîşeyên Lovelace di dîroka programkariya kompîturê de bû xwedî cihekî girîng.

Charles Babbage yê li Cambridgeyê bi Ada Lovelace re xebat dikirin,





ji ber qabiliyeta matematîkê ya Lovelaca bi navê 'Sêrhbaza hejmaran' xîtabê wê dikir û xîtaba wî bi vî awayî derbasî dîrokê bû.

Di oxira zanistê de...

Fîzîkvan û kîmyager Maria Sklodowska ku bi eslê xwe fransî ye û wek Madam Curie tê nasîn (1867-1934) di qada zanîstê de yek ji jinên pêşeng e.

Curie ku di qada radyoaktîvîteyê de dixebitî û bi xebatên xwe pêşengî ji fîzîka keriyan şeşan a atomê re kirî, di destpêka sedsala 20'emîn de di ceribandinên xwe yên elementa uranyumê de zêdekirina fealiyeta parçika şeşan a atomê kişf kir. Û bi vê kişfkirina xwe derbasî dîrokê bû.

Bi van xebatên xwe re Curie di sala 1903'yan de di qada fîzîkê de û di sala 1911'an de jî di qada kîmyayê de layiqê Xelatên Nobelê hat dîtin. Bi vê re Curie hem bû jina yekem ku Xelata Nobelê girt hem jî di heman demê de bû jina yekem ku cara duyemîn vê xelatê girtiye.

Di heman demê de Curie tev li Konferansa Solvay bû ku sê salan carekê pêk dihat û fîzîkvan û kîmyagerên navdar ên cîhanê tev lê dibûn. Ji ber vê yekê bû jina yekem ku tev li vê konferansê bûye.

Curie di dema xebatên xwe de ji ber zêde bi radyasyonê re rû bi rû ma ji nexweşiya pençeşêre canê xwe ji dest da. Ji ber vê yekê Madam Curie wek 'Jina ku di oxira zanistê de canê xwe ji dest da' derbasî dîrokê bû.

Barre Sinoussi

Jina zanist a fransî Françoise Barre Sinoussî bi kişfkirina HIV'ê ya dibe sedema nexweşiya AIDS'ê derbasî dîrokê bû.

Barre Sinoussi di sala 1983'yan de di nav koma ku ji bo lêkolînkirina mîkrop ango vîrûsek dibe sedema nexweşiya AIDS'ê hatibû avakirin de cih girt û tenê di nav du hefteyan de ev zanîna xwe piştrast kir.

Ev vîrûs ji ber xisardayîna pergala parastina laşê mirovan navê 'human immunodeficiency virus (vîrûsa kêmaniya pergala parastina mirovan)' yanî HIV hat dayîn.

Her wiha Barre Sinoussi bi vê kişfa xwe di sala 2008'an de li kategoriya fîzyolojiyê ango tibê de Xelata Nobalê girt.



Rita Levi Montalcini

Lêkolînvana tibê Rita Levi Montalcini ku di sala 1909'an de li bajarê Turîn ê Îtalyayê hat dinê, bi kişfkirina faktora mezinbûna tûrê re gelek xebatên li ser pêşketina pergala tûrê û cudabûnên wê kirine.

Levi Montanlcin ku ji ber kişfa xwe ya 'faktorê mezinbûna tûrê' Xelata Nobelê ya Fîzyolojiyê ango tibê girt, di 103 saliya xwe de canê xwe ji dest da.

Her wiha Levi Montalcini ku bi xebatên xwe yên zanistê tê nasîn, ji ber gihiştina 100 saliya xwe bû xwedî nasnava mirova zanista yekem a Xelata Nobelê.



Amelia Earhart

Amelia Earthart jina pîlot a yekem e ku bi balafirê Antlantîkê bi tena serê xwe derbas kiriye. Earthart li eyaleta Kansasê ya Amerîkayê hatiye dinê. Wekî jineke wêrek di qada hewavaniyê de gelek rakoran şikandiye û bi van rekorên xwe ji zîhniyeta mêr ku digot tu nikare vî karî bike re bû bersiv.

Balafira Earthart di dema rêwîtiya ber bi Girava Howlandê de li ser Oqyanûsa Pasîfîkê winda bû û tevî hemû xebatên lêgerînê jî çi ew çi jî balafira wê nehatin dîtin.

Ji ber vê yekê Amelia Earthart ku di 2'yê tîrmeha 1937'an de winda bibû, di 20'ê hezîrana 1938'an de mirî hat îlankirin.

Simone de Beauvoir

Feylesofa hebûnê, nivîskar û teorîsyena siyasî. Parêzvana navdar a mafê jinan. Pirtûka wê ya 'Zayenda Duyemîn' hema bêje bû manîfestoya tevgerên jinan. Wek avakara femînîzma modern tê dîtin.

Bi nivîsîna pirtûk, gotar, helbest û romanên xwe di dîrokê de bû yek ji pêşengên parêzvanên mafên jinan.

Nancy Astor

Nancy Astor jina yekem e ku ket parlamentoya îngilîzan û siyaseta îngilîzan ji binî ve guhert. Astor parlamenterî di nav jinan de belav bibe û jin jî bikevin nav parlamentoyê xebitiye. Di Partiya Karkeran û Lîbarelan de ji bo jin bikevin parlamentoyê gelek xebat kirine û di nav du salan de gelek jin kirin parlamentoyê.

Astor her çiqas bi demê re bi dijberiya xwe ya komunîzmê û cihûyan hatibe nasîn jî wê navê xwe wek jina yekem ku ket parlamentoya îngilîzan li dîrokê nivîsand.

Benazir Butto

Serokdewleta yekem a jina misilman e û du caran serokdewletiya Pakistanê kir.

Butto di nav misilmanan de tabuyek serobino kir û bi vî awayî navê xwe li dîrokê nivîsand.

Butto ku ji ber rewşa siyasî 8 salan li sirgûnê jiya, di sala 2007'an de tevî hemû gefên El Kaîdeyê dîsa ji bo tev li hilbijartina serokdewletiyê bibe di 18'ê cotmeha 2007'an de vedigere Pakistanê. Butto roja vegera xwe ya ku ji aliyê alîgirên xwe ve bi kêfxweşî hat pêşwazîkirin, dibe hedefa suîkasteke bombeyî. Di wê êrîşa suîkastê de 130 kesan canê xwe ji dest dan.

Butto di 27'ê kanûna 2007'an de di mîtînga xwe ya hilbijartinê de bi suîkastekê hat kuştin.



Ji bo heman armancê

Ev jinên ku me qala kurtejiyana wan û xebatên wan kir, her çiqas qad û demên cuda de jiyabin jî ji bo heman tiştî têkoşiyane. Van jinan di qad û demên cuda de li dijî zîhniyeta mêr ku li her qada jiyanê jinan tune dihesibînin li ber xwe dan û mohra xwe li gelek xebatên girîng dane.



Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

Têkoşîna li dijî çanda tecawizê demdirêj e (1)

Ew ê hîn pir tişt bên gotin. Pir li ser bê axaftin. Divê bê gotin jî. Kes bêdeng nemîne. Dê rojnamevan li gorî rengê xwe/sekna xwe mijarê bigirin dest, dozger li gorî pergala xwe, malbat li gorî hişmendiya xwe, civat li gorî têgihiştina xwe, heta faîl jî li gorî xwe dê tevbigerin. Dê her kesek tiştek bêje. Tenê dengê qurbanê dê neyê bihîstin. Deng ji xwe ji binaxê nayê lê li ser axê jî bêdeng e qurban; li wir jî mirî.

Di mijara çanda tecawizê (rape culture) de ku mijar ne tenê destdirêjî ye, pirsgirêka herî mezin bêdengî an jî nebihîstina dengê jinê yan jî qurbanî ye. Her çiqas jinê bi giştî wek 'qurban' binavkirin li gorî min bi pirsgirêk be jî, di çanda tecawizê de êrîşa ser îradeya jinê, jinê dike wek qurban û ji ber vê yekê ji peyva qurbanî wêdetir peyv di destê me de namîne.

Sedemên çanda tecawizê, têkiliya wê ya bi baviksalarî, desthilatdarî, mêtingerî, şer û serdestiyê dê ne mijarên vê nivîsê bin. Sedem êdî xuya bûne, aşkera ne, bêşerm û bêrûmet in; her roj tiliyên xwe dixin nav çavên me, êrîşî jinan dikin. Lê bi qasî sedeman divê li ser têkoşîna li dijî çanda tecawizê jî bê sekinandin da ku em karibin çend encamên şênber jê derxin û deynin pêşberî civaka xwe û bi taybetî pêşberî jinên ciwan.

Êrîşa zayendperest a li dijî jinan li her derê cîhanê heye û ne tenê aîdê çand an jî heremekê ye. Lê jin vê êrîşê li gorî taybetmendiyên civaka xwe cuda cuda dijîn. Wexta li hin deverên cîhanê jin bi kampanyayên wek 'me too', 'no means no', û 'ni una menos' balê dikişînin ser îradeya jinê û biryara wê ya azad, li hin deverên din jin li dijî sûcdarkirina qurbanê ku dawiya dawî jinê wek texrîkkar dibîne, têdikoşin.

Têkoşîna li dijî tecawizê divê li ser du milan bimeşe: yek jê divê hedefên demdirêj bigire pêşiya xwe û hemî civakê wek koma hedef bibîne. Ango di vê plansaziyê de mijarên li jêr ku li gorî teorî û pratîkên tevgerên jinan hatine rêzekirin, divê bên destgirtin:

- Sedemên çanda tecawizê teşhîr bikin û red bikin; hişmendiya ku serdestî û tundiyê 'nêr' û 'xurt', lawazî û bindestiyê 'jin' û 'keç' dibîne, sedema berdewamkirina çanda tecawizê ye.

- Bi rexne li mêrantiyê (û li jintiyê) binêrin, ka ev mîrate ji bo we tên çi wate ê; bi amûrên xwe-rexneyî û axaftinên komî hewl bidin, mêrantiyê bi rêbazên femînîstî ji nû ve pênase bikin.

- Têgihiştina xwe ya der barê çanda tecawizê de berfirehtir bikin; çanda tecawizê ne tenê destdirêjî ye, bi giştî hemî çalakiyên zirarbar li hember keçik û jinan, ên ku xweserî û azadiya wan ji wan distînin, tundiya li ser jinê, zewaca temen biçûk û ya bêdil, sunneta jinan, qelen, tacîz û hwd, ev hemî mînakên çanda tecawizê ne.

- Jinê sûcdar nebînin; ne kinc, ne vexwarin, ne dem û cîhê ku jin lê ye, nikarin wek sedem ji bo çanda tecawizê bê dîtin û nirxandin. Ev nêrîn destdirêjiyê rewa dike, jinê tawanbar dike. Ev rûreşî ye, divê bê dîtin.

- Çanda tecawizê tolere nekin; li ku dijîn bijîn, an jî bixebitin tundiya li ser jinê nepejirînin. Xwe berpirsiyar bibînin. Berpirsiyarî negirtin hevkariya sûcdariyê ye.

- Kategoriyên wek etnîsîte, zayend, nijad, ol û hwd. ast û bandora şîdetê û çanda tecawizê zêde dikin. Wek mînak mêtingerî şîdeta li ser jina neteweya bindest wek amûrê serdestiyê bi kar tîne. An jî homofobî şîdeta li ser kesên lgbtî rewa dike. Fundementalî/paşverûtî tunekirina olên din ji xwe re dike limêj.

- Jin xwe birêxistin bikin; tenê perwerde jinan ji destdirêjiyê naparêze. Bi her awayî îspatkirî ye ku jina rêxistinkirî zilmê napejirîne û li dijî wê serî radike. Her wiha sazî û dezgehên xweser ên jinan hêzê didin jinê, xweseriya wê pê didin nasîn û di rewşa şîdetê de bi hevkarî û alîkariyê kesa qurban ji rewşa têdeyî xelas dikin. Peşî li (xwe) kuştinê tê girtin.

- Ji bo bidawîanîna çanda tecawizê divê berpirsiyar bên cezakirin. Bi darizandin û mehkûmkirina tawanbaran civak çanda tecawizê wek sûc dibîne û dipejirîne. Darizandin bi tena serê xwe çanda tecawizê ji holê ranake, li gel vê divê hemû sazî û dezgehên fermî ji vê hişmendiyê bên rizgarkirin û li gorî esasa wekheviya zayendan ji nû ve bên sazûmankirin.

- Nerazîbûna xwe ya li dijî çanda tecawizê û şîdeta li ser jinê nîşan bidin: jin li her derê civakê, li ser kolanan, li mal, li kar leqayî şîdetê tên. Ev sûc pirî caran li pêş çavên dehan kesan tê kirin û sûcdar heta bêyî bireve, di rêya xwe de dimeşe diçe. Sûcdar wêrekiya xwe ji bêdengiya civakê digire. Nerazîbûn dê sûcdarî bixe nav fikaran.

- Zarokên xwe li gorî rêbazên wekheviya zayendan mezin bikin. Wan bi dubendiyên çêkirî û stereotipên zayendî perwerde nekin. Li hember dubendiyên li ser kolanan, li nav malê û civakê û li dibistanê têbikoşin.

Di nivîsa pêş de em ê li ser hedefên demkin/şênber û plansazkirina wan bisekinin.

rupel 3+++.qxp_Layout 1 4.09.2020 19:35 Page 1

Tenê dîwar lê nakin...

Armanca lêkirina dîwarê rêya trênê ya di nav Amedê re derbas dibe, ne tênê nûkirin e, di heman demê de ji hêla ewlehiyê ve kontrolkirina bajêr e. Divê siyasetmedarên kurd jî li gorî vê nêzî lêkirina dîwar bibin

Qedrî Esen

Bajarê Amedê ku li ber dilê kurdan gelek şêrîn e û weke paytexta Kurdistanê tê qebûlkirin, ji bo rantê û polîtîkayên ewlehiyê di hedefa dewletê û desthilata AKP'ê de ye. Piştî rûxandina navçeya wê ya dîrokî Sûrê niha jî tê armanckirin ku Amed bi tevahî bê dabeşkirin.

Ev yek bi destê Midûriyeta Herêma 5'emîn a Rêyên Hesin a Dewletê tê kirin. Midûriyeta navborî, di bin navê nûkirina rêya trênê ya di nav Amedê re derbas dibe de dixwaze bi dîwarekî bi qasî 2 metreyan bilind navenda Amedê dabeş bike.

Armanc ne ji bo xêrê ye

Heke jê re nûkirin bê gotin gelo li navenda Amedê pêwistî bi nûkirineke bi vî rengî heye?

Teqez na. Lewre tişta ku tê kirin ne nûkirin tenê ji bo rant û polîtîkayên ewlehiyê astengkirina pêşveçûna bajêr e. Heke armanc nûkiribûna diviyabû ku destpêkê seferên trênên bar bihatina rawestandin û ji navenda bajar bihatina derxistin.

Ji ber ku armanc ne ji bo xêrê ye, projeyek baş ji bo nûkirinê nehatiye amadekirin. Bi projeya heyî hemû rê û dirbên çûn û hatina mirovan a bi pêya tên girtin. Ev yek jî bandoreke mezin li jiyana rojane ya nav bajêr dike.

Ewlehiya dewletê

Dîsa bi vê tê xwestin ku bajêr bi van dîwaran bê kontrolkirin û liv û tevgera li nav bajar li gorî daxwaza dewletê bê kirin. Çawa ku gelek rêyên bejahiyê ne ji bo welatiyan ji bo operasyonên leşkerî tên çêkirin, ev dîwar jî ne ji bo ewlehiya welatiyan ji bo ewlehiya dewletê tê çêkirin.

Bi gotineke din ev dîwar ne dîwarê xêrê ye. Divê ev ji aliyê herkesî ve bê zanîn û li gorî vê helwest bê nîşandan. Heke wiha nebe dibe ku piştî vê projeyê ji bo kontrolkirina bajêr hin projeyên din jî bikevin meriyetê.

Rê tê zexmkirin

Mînak beriya çend salan dema ku Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê di destê DBP'ê de bû, ji bo rêya trênê ya nav bajêr projeyek hatibû amadekirin. Li gorî vê projeyê dê rêya heyî derketina derveyî bajêr û li her du aliyên rê dar bihatina çandin.

Dîsa ji bo parqên bi dîwar ên nav bajêr biryara hilweşandina dîwarên wan hatibû dayîn lê tişta tê kirin berovajiyê vê ye. Li şûna derxistina derveyî bajêr, rêya heyî tê zexmkirin û bi dîwarên bilind rê û dirb li nişstecihên bajêr tên girtin.

Daxwazên rêxistinên sivîl û gel

Ji ber vê sedemê 21 rêxistinên sivîl ên li Amedê li dijî projeyê derketin. Rêxistinan der barê mijarê de daxuyaniyên hevpar dan û xwestin ku proje demildest bê rawestandin û ji bo berdewamkirinê careke din bê nirxandin.

Her wiha rêxistinan pêşniyar kir ku seferên bar ên li ser rêya trênê ya heyî bên rawestandin û ji bo van seferan li derveyî bajar rêyek nû bê çêkirin û rêya heyî tenê ji bo rêwitiyê bê bikaranîn.


Gelê Amedê jî li ser medyaya civakî li dijî projeyê derket û daxwaz kir ku li şûna betona heta 12 kîlometreyan a li her du aliyên rê, dar bên çandin. Ev bertek û daxwaz di cih de ne û heta pêkanîna vê jî divê şopandin bê kirin.

Divê armanc bê teşhîrkirin

Parlamenterên HDP'ê yên Amedê Garo Paylan û Semra Guzel jî projeyê birin rojeva meclisê daxwaza rawestandina projeyê kirin. Lê li gorî min tenê daxwaza rawestandinê ne bes e. Divê ji hêla siyasetmedarên kurd ve armanca dewletê ya nûkirina rê jî bê teşhîrkirin.

Piştî van hewldanên rêxistinên sivîl û HDP'ê Wezareta Ragihandin û Binesaziyê ya Tirkiyeyê projeyê da rawestandin lê ev nayê wê wateyê ku wê careke din proje neyê berdewamkirin.





Vîrûsa koronayê li her tax û gundî belav bûye

Ray li vîrûsa koronayê ku dawiya sala borî peyda bû, nabe û her roja derbas dibe hê bêtir mirov pê dikevin û jiyana xwe ji dest didin.

Li seranserê cîhanê hejmara kesên bi vîrûsa koronayê ketine bi seriya 26 milyon kesan ket. Hejmara kesên pê jiyana xwe ji dest didin jî nêzî milyonek bû. Welatên ku herî zêde mirov bi vîrûsê dikevin û pê dimirin Amerîka û Brezîlya ne.

Li Tirkiye û bakurê Kurdistanê jî li gorî daneyên fermî yên hikûmetê di seriya 270 hezar kesî de mirov bi vîrûsê ketine û zêdetirî 6 hezar kes jî pê mirine.

Hikûmeta AKP-MHP'ê ji ber fikarên aborî, daneyên rast ên vîrûsê ji raya giştî vedişêre.

Di rojên dawîn de li gel veşartinê jî zêdebûna hejmara pêketiyên vîrûsê û kesên pê dimirin, di daneyên hikûmetê de jî xwe da der. Wezîrê Tenduristiyê yê Tirkiyeyê Fahrettîn Koca, ragihand ku ji ber zêdebûna bi lez a pêketiyan li gelek bajaran pirsgirêkên nexweşxaneyan derketine.

Bi taybetî jî pirsgirêka nexweşxaneyan li bajarên bakurê Kurdistanê heye. Li bajarên Bakur piraniya pêketiyên vîrûsa koronayê bêyî ku bên tedawîkirin ji ber derê nexweşxaneyan tên vegerandin. Ji ber vê yekê jî nexweşî belavî her derî bûye.

Li bakurê Kurdistanê tu tax û gundekî ku virûsa koronayê derbas nebûbe nemaye. Her roj li tax û gundan agahiyên mirina welatiyan tên.

Li gel vê rewşa kambax jî xemsariya dewletê ya li hemberî kurdan didome û bergiriyên ku ji aliyê rêxistinên tenduristiyê û gel ve tên xwestin nayên girtin.


Li bajarên Tirkiyeyê jî rewş ji bajarên bakurê Kurdistanê pir cuda nîne.

Herî dawî hat ragihandin ku serokwezîrê berê yê Tirkiyeyê Bînalî Yildirim û hevjîna xwe Semîha Yildirim jî bi vîrûsa koronayê ketine.

AMED

Hem tecawizkar hem jî êrîşkar in!

Navenda Nûçeyan



Zihniyeta tecawizkar û kujer a dewletê, ji ber kiryarên wan, tecawizkar û kujerên jin û zarokên kurd xelat dike. Polîs û leşkerên tecawizkar bi saya vê zihniyetê, ne tên darizandin û ne jî tên girtin.

Herî dawî jî li navçeya Qubînê ya Êlihê çawişê pispor Mûsa Orhan dest dirêjî keça ciwan Îpek Er kiribû. Piştî vê dest dirêjiyê Er hewl dabû dawî li jiyana xwe bîne û li nexweşxaneya ku lê tedawî didît jiyana xwe ji dest dabû.

Çawişê tecawizkar Mûsa Orhan piştî vê yekê ji ber bertekên zêde yên li hemberî dewletê hatibû binçavkirin û girtin. Lê ji ber xwedîderketina lê ya Wezîrê Karên Hundir ê Tirkiyeyê Suleyman Soylû, tecawizkar Mûsa Orhan, hat berdan.

Atay kir hedef

Ev hem di nav kurdan de hem jî di nav raya giştî ya Tirkiyeyê de bû sedema bertekên mezin. Gelek derdorên cuda der barê mijarê de daxuyanî dan û bertek nîşanî xwedîderketina Soylû ya ji bo Mûsa Orhan dan.

Yek ji van kesan jî Alîkarê Serokê Giştî yê Partiya Karkeran a Tirkiyeyê û Parlamenterê Hatayê Bariş Atay bû. Atay, li ser hesabê xwe yê medyaya civakî bertek nîşanî Soylû da û got ku tecawizkaran diparêze.

Soylû xwe li vê rexne û berteka Bariş Atay, ranegirt û Atay kir hedef. Piştî hedefnîşandina Soylû bi çend saetan Bariş Atay, li navçeya Kadikoyê ya Stenbolê bi êrîşeke fizîkî re rû bi rû ma.

'Soylû aliyê tecawizkaran e'

Di serî de HDP û CHP gelek partiyên muxalefetê bi awayekî tund bertek nîşanî Soylû dan û gotin ku li şûna wezîrtiyê serokatiya mafyayê dike.

Bariş Atay jî destnîşan kir ku Soylû li hemberî keça ciwan Îpek Er li aliyê çawişê pispor ê tecawizkar Mûsa Orhan e û got ku wê dev ji têkoşîna xwe bernede.

Li gel ku destpêkê êrîşkar nehatin binçavkirin jî piştî çend rojan ji ber bertekên zêde 3 kes ji ber êrîşê hatin binçavkirin û girtin.

rupel 4.qxp_Layout 1 4.09.2020 20:10 Page 1

XWESTEKA CIVAKÊ PÊKHATINA EDALETÊ YE

Divê CPT û DMME bi erka xwe rabin

→ **Felat Nîştiman**

Metirsiya Kovîd-19'ê ya li girtîgehan, mafê darzandina adilane û parastinê, tecrîd û binpêkirina mafên li girtîgehan di rojevê de ne. Li aliyekî piraniya civakê li benda çareserkirina van pirsgirêkan e, li aliyê din ev pirsgirêk her diçe dijwartir dibin. Rojnameya me van mijaran bi rêveberê MED TUHAD-FED 'ê (Federasyona Komeleyên Hiqûq û Piştevaniyê ya Malbatên Girtî û Hukumxwaran a Medê) û endamê komîsyona girtîgehan a Komeleya Hiqûqnasên ji bo Azadiyê parêzer Yûsûf Çaqas re gotûbêj kir.

Li gor agahiyên der barê girtîgehan de, ji ber kêmasî û paşguhkirina bergiriyan, Kovîd-19 her diçe li girtîgehan belav dibe. Ji bo vê mijarê dikarî çi bêjî?

Niha beriya em vê mijarê binirxînin, divê em bi kurtî behsa pêvajoya Kovîd-19'ê ya ji meha adarê û heta roja me ya îro bikin. Despêkê dema li girtîgehan bergirî hatin wergirtin, me piştgirî da wan bergiriyên ji bo tenduristiyê. Divê li girtîgehan Kovîd-19 belav nebûya. Wek li gelek deverên cîhanê me destpêkê got divê hemû girtî û hikumxwar bêyî şert û şirût bi awayekî werin berdan. Me got ku metirsiyeke kûrewî, metirsiya şewbê heye; di van şert û mercan de mayîna girtiyan a li girtîgtehan ne rast e. Piştre ev daxwaz pêk nehat, hin tedbîr hatin wergirtin lê divê ev tedbîr veneguheziyana tecrîdê. Dema me li ser vê mijarê nîqaş dikir, helwesta giştî ya li ser mijarê ev bû; gotin ew ê tedbîran bigirin lê bi xemsarî nêzî vê mijara girîng bûn.

Destpêkê hejmara nexweşên bi şewbê aşkera dikirin. Daneyên girtî, hikumxwar û karmendên bi Kovîd-19'ê diketin digotin lê paşê me dît ku wezîr êdî dev ji van daxuyaniyan berda. Niha wezîr li ser vê mijarê daxuyanî nade lê em bixwe dizanin ku pêketiyên vîrûsê hene. Hem karmend hem jî girtî û hikumxwar bi şewbê ketine. Karmendên girtîgehan ji me re dibêjin lê der barê vê de daxuyeniyeke fermî tune ye. Em dikarin bêjin, li her derê heye. Em niha nikarin statîstîkek derxin û bêjin ku ewqas girtî û karmend bi şewbê ketine. Em dizanin ku bergiriyên heyî tevî ku vediguhezin tecrîdê jî nikarin pêşî li vê şewbê bigirin. Ev tişt li ber çavan e. Şewb gelek berbelav bûye. Êdî civak jî dizane nexweşî di çi astê de ye. Em dîsa tên serî, em dibêjin bergiriyên we pêşî li vê şewbê negirtin û nagirin. Çareseriya esas ev e ku divê girtî û hikumxwar ji ber şewba Kovîd-19'ê demildest werin berdan. Qanûna înfazê derket lê me dît ku ev negihîşt tu encamekê.

Piraniya van girtiyan, girtiyên siyasî ne yan ên edlî ne?

Piraniya wan edlî ne. Girtiyên sîyasî, pir kêm ji wan ji vê qanûnê îstîfade kirin.

Li ber destê we dane hene?

Li ber destê me hejmarek tune ye. Çawa jê îstîfade kirin? Hin girtiyên temenê wan di navbera 15-18'an de bûn hatin berdan. Ji girtîgehên ku girtiyên siyasî li wan in, ji her girtîgehê du-sê girtî hatin berdan û ji hin girtîgehan kesek jî nehat berdan. Çimkî li hin girtîgehan tenê hikumxwar hene, hikumxwarên kevn ên 20-25-30 sal in hatine girtin. Rewşa giştî bi vî rengî ye. Bi giştî dema em li rewşê dinêrin bandoreke erênî ya bergiriyan jî çênebû. Jixwe daxuyaniyên bi pîr û pergal jî nayên dayîn.

Di vê mijarê de pêşniyara te ji bo çareseriyê çi ye?

Pêşniyara min, çawa ku li gelek welatên din hatiye rojevê; hemû rêxistinên civakî yên sivîl pêşniyar dikin; malbatên hemû girtî û hukumuxwaran û her wiha civak dixwaze û diyar dike, divê girtîgeh ji ber Kovîd-19'ê bên valakirin.

Parêzer Ebrû Tîmtîk a bi daxwaza darazandina adilane ketibû greva birçîbûnê, canê xwe ji dest da û greva parêzer Aytaç Unsal jî hê didome. Hem wek parêzer hem jî wek sazî hûn ji bo vê rewşê çi dibêjin?

Di rewşên wiha de nêzîkatiya me ya giştî ji bo jiyandinê ye. Divê felsefeya me li ser jiyandinê be. Li hemberî hemû hişmediyên kuştin û tunekirinê helwesteke me heye. Li vê derê em behsa parêzeran dikin ku ji bo bi awayekî adilane bên darizandin xwe dane ber mirinê. Tenê ne ji bo xwe, ji bo hemû cavakê darizandina adilane dixwazin. Heger parêzer ji bo darazeke adilane bedena xwe didin ber mirinê, divê em bi rastî bizanibin ku pirsgirêka daraza adilane heye. Divê ev pirsgirêk bi lezgînî bên gotûbêjkirin û werin çareserkirin lê hevaleke me ya parêzer canê xwe ji dest da û rewşa hevalê me yê din jî ne baş e. Divê teqez daraza adilane bê sazkirin.

Bila herin bi malbatên girtî û hukumxwaran re anketan çêbikin. Gelo wê çend kes bêjin bi adilane hatine darizandin? Bila vê pirsê ji civakê bixwe jî bikin. Dema em vana hemûyan tînin ba hev, mirov dibîne ku li holê pirsgirêkeke mezin heye. Cihê ku em ê li ser rê û rêbazên nû biaxivin û çareseriyê pêk bînin, her diçe rewşê xirabtir dikin û dixitimînin. Divê hiqûq ji bo civakê be.

Bi te vê rewşa niha û pergala hiqûqê ya heyî dikare bê domandin?

Rewşa niha nikare bê domandin. Çima? Te dî gelek darizandinên berê bi dek û dolaban, bi delîlên sexte, bi şahidên veşarî hatibûn kirin. Jixwe pergela hiqûqê nikare bi vî awayî bidome. Heger baweriya civakê ji daraz û hiqûqê nemabe ev pirsgirêka me ye. Esasên hiqûqê nayên bicihkirin. Divê herkes bi awayekî adilane bê darizandin. Mafên daraza adilane û parastinê yên herkesî ne.

Bi desthilata AKP'ê re hejmara girtîgehan zêde bû û hê jî tên çêkirin. Li gorî daneyên li ber destê we, çend girtîgeh, girtî û hukumxwar hene?

Nêzî 400 girtîgeh hene. Berî qanûna înfaza cezayan beriya pandemiyê nêzî 300 hezar girtî hebûn. 70-80 hezar kes hatin berdan. Niha zêdetirî 200 hezar mirov hê jî di girtîgehan de ne. Di 14 salên dawîn de 178 girtîgeh hatine çêkirin. Ev yek nîşan dide ku di warên darizandina adilane, mafê parastinê, azadî, ewlehiya kesan û azadiya wan de paşveçûneke berbiçav heye. Ez mînakeke şênber bidim. Di sala 2013'an de li gorî qanûna 911'an hemû xwepêşandan û meş ên bêyî tundiyê ne sûc bûn; îro jî daxuyaniyeke çapemeniyê dibe sûc û ceza tê birîn. Ji 2013'an heta 2020'an pergala hiqûqê guherî. Ji xeta azadîxwaz ber bi xeta ewlekariyê ve çû. Niha hiqûq li gorî pêvajoyê tê nirxandin. Hiqûq li gorî rewşê biguhere em nikarin behsa azadiya fikrî û nêzakatiyeke azadîxwaz bikin. Jixwe dozên li siyasetmedaran hatine vekirin sosret in. Siyasetmedar xwedî mafê rexnekirinê ye. Ev şerê di navbera xeta azadîxwaz û xeta ewlekariyê de ye. Wiha bidome wê hejmara girtî û girtîgehan hê jî zêde bibe.

Niha çend girtî û hukumxwarên bi nexweşiyên giran hene? Ji bo berdana wan xebatên we çi ne û divê ji bo vê gel, partiyên siyasî, saziyên sivîl çi bikin?

Divê em mafên nexweşan û mafên tenduristiyê bi hev re binirxînin. Li gorî peymanên navneteweyî, destûra bingehîn û qanûnan, girtî tenê nikarin mafekî bi kar bînin; ji bilî mafê geşt û gerê xwedî hemû mafan in. Em rewşa girtîgehan û metirsiya Kovîd-19'ê bidin ber çavan, ne pêkan e girtî li girtîgehan bitendurist bimînin. Divê em qebûl bikin ku hemû kesên li girtîgehan nexweş in! Li girtîgehan şert û mercên bitendurist tune ne. Kî ne nexweşên rewşa wan giran? Ew nexweş in ku saziya tiba edlî rapora nikare di girtîgehê de bimîne daye wan. Saziya tiba edlî rapor daye gotiye ev kes nikarin li girtîgehê bimînin lê dadger dibêje ku heger ev kes derê wê bibe metirsî ji bo ewlehiya civakê. Ev jî heye, divê em bêjin gelo saziya tiba edlî raporan çiqas rast amade dike. Li gorî daneyên me nêzî 200 nexweşên nikarin li girtîgehê bimînin hene. Ji bilî van nexweşên rewşa wan giran, bi hezaran jî kesên nexweş hene. Ango bêyî gotûbêj li ser bê kirin, niha 200 kesên divê tavilê bên berdan hene. Divê êdî ev pirsgirêk bê çareserkirin. Dema nexweş diçin nexweşxaneyê û vedigerin girtîgehê, wan 15 rojan dikin karantînayê. Ji ber nikarin pêdiviyên xwe bi cih bînin, ji neçarî hevalek wan jî li ba wan dimîne.



Nexweşên bi vî rengî hene ku saziya tiba edlî gotiye dikare li girtîgehê bimîne.

Yanî hûn dibêjin saziya tiba edlî biryarên adilane nade?

Erê. Biryarên adilane nade. Hin hevalên van nexweşan hene, tevî ku metirsiya Kovîd-19'ê heye dîsa jî li ba van hevalên xwe dimînin.

Demeke dirêj e li ser Abdullah Ocalan tecrîd heye. Herî dawî bi telefonê bi malbata xwe re axivîbû. Gelek saziyên sivîl û partiyên siyasî dibêjin, yek ji sedemên pirsgirêkên heyî jî ev tecrîd e û heger tecrîd rabe gelek pirsgirêk dikarin bên gotûbêj û çareserkirin. Herî dawî CPT'yê jî der barê girtîgeha Îmraliyê de raporek belav kir. Tu ji bo vê mijarê çi dibêjî û divê çi bê kirin?

Divê ji aliyê hiqûqî û siyasî ve ev mesele bê gotûbêjkirin. Girtî û hukumxwar divê hemû mafên xwe yên di çarçovaya qanûnan de bi kar bînin. Dema em birêz Abdullah Ocalan di çarçoveya hukumxwarek de binirxînin, mafê wî yê axaftina bi telefonê heye; mafê hevdîtina vekirî û girtî heye û mafê wî yê hevdîtina bi parêzeran re heye. Qanûnek taybet heye bêje birêz Abdullah Ocalan nikare van mafan bi kar bîne? Na tune ye. Yanî em bêhiqûqiyê nîqaş dikin. Nasnekirina van mafan bêhiqûqî ye. Divê em rapora CPT'ê jî di vê çarçoveyê de binirxînin. Di dawiya sala 2018'an de ji bo mafên qanûnî greva birçîbûnê hat kirin. Piştî demekê ev maf hatin dayîn lê piştre dîsa tecrîdê dest pê kir. Mafên girtî û hukumxwaran çi bin, ên birêz Ocalan jî ew in.

Dema hevdîtin pê re tên kirin, atmosferek germ û hêviyên çaresiyê çêdibin. Di 2013-2014'an de rewşeke wiha hebû. Bi her awayî bêhna hemû civakê derdikeve dema hevdîtin tên kirin. Em sazî û hiqûqnas tiştên nû nabêjin, ev hemû hatine gotin û gotûbêjkirin. Rewşa girtî û hukumxwaran ji rewşa derve ne bêrî ye. Her du bi hev ve girêdayî ne. Divê em li ser rejîma înfazaya cezayan bisekinin. Bi îzolekirin û tecrîdê nikarin tu encamê bi dest bixin. Rewşa girtî û hukumuxwaran pirsgirêka giştî ya civakê ye. Di vî warî de xwesteka civakê heye, divê ev pirsgirêk bên çareserkirin. Bi taybetî divê saziyên navneteweyî li ser van meseleyan bisekinin û bi hestiyar tevbigerin. Îro, pirsgirêkeke welatekî ya hemû cîhanê ye. Cîhan ne ya berê ye. Hemû pirsgirêk bi hev ve girêdayî ne. Li ku derê bêhiqûqiyek hebe, divê herkes dengê xwe li hemberî vê bilind bike.

Bi te saziyên navneteweyî rol û misyonên xwe tînin cih? Bi taybetî ji bo rakirina tecrîdê û mafê darizandina adilane dikarin çi bikin?

Di demeke nêzîk de wê serokê Em hiqûqnas dibêjin ku DMME û CPT biryarên xwe naynin cih. Di rewşa heyî de helwesta saziyên navneteweyî pir qels e. Heger îro tecrîdek hebe, para CPT'ê jî heye. Dikare ji bo çareseriyê gav bavêje lê tiştek nake. Mesela heger hê jî Selahattîn Demîrtaş di girtîgehê de be, para DMME'yê jî di vê de heye. Danekirinên curbicur ên pêkneanîna biryarên DMME'yê hene lê pêk naynin.

Çima pêk naynin?

Dema hat em ê bibînin. Wê bi xwe vê meseleyê vebêjin. Heger kulîsên siyasî yên em di çapemeniyê de dibînin tune bin, wê rexneyên tund bikin; lê heger kulîsên wan hebin wê ev dîsa pêk neyê.

Amadekariya saziyên hiqûqê heye ji bo vê serdanê?

Me bi rêya çapemeniyê gelek caran bêmafî û bêhiqûqiyên heyî, lîsteyên girtiyên nexweş ragihandine. Jixwe haya van saziyan ji hemû pirsgirêkan heye. Saziyên sivîl qels be jî peywira xwe anîne cih, hemû tişt ragihandine. Êdî maye li ser van saziyan; wê peywira xwe çiqas pêk bînin em ê bibînin.

Herî dawî dixwazî çi bêjî?

Li Tirkiyêyê herkes dikare were girtin û bikeve girtîgehê. Divê em bi vê rastiyê bizanibin. Bi taybetî divê em helwest û pêkanînên dozger, dadger û polîsên demekê li ser darazê bûn, bînin ber çavan û li rewşa wan a niha binêrin. Divê em meseleya darazê, li ser bingeha hiqûqê binirxînin, ne wek meseleyeke polîtîk. Divê herkes, civak ji bo nexweşên di girtîgehê de hestiyar be; bi partiyên xwe yên siyasî û civaka xwe ya sivîl ve.

rupel 5+++.qxp_Layout 1 4.09.2020 19:32 Page 1

Ristemê Zal kî ye?

Mem Farqînî



Gava demsal dibû dawiya payîzê, şêniyên gund tevan kar û xebatên xwe diqedandin. Û li benda zivistanê, li benda wan şevên dirêj diman. Ew ê jî piştî ew qas kar xebat û westandinê bêhna xwe bidana. Heta bihareke din wê hêdî hêdî amadekariya xwe bikirina. Dayika xweza heta careke din xwe komî ser hev bike, ew ê jî biketina nav şahiyê; kêfa rojên bêkar bikirina.

Demsala zivistanê ji bo gundiyan dibû destpêkek nû. Di van şevên zivistanê yên dirêj de, dihatin cem hev û heta derengiya şevê bi qerf û henekan, dem derbas dikirin. Ev tişt hema hema tim wisa bû. Jiyana rojane jî bi gelemperî bi vî awayî derbas dikirin. Vaye careke din zivistan bi hemû heybeta xwe li ser pişta hespa xwe rûniştibû. Bi çar gavkî ber bi wan ve dihat; ji bo were û li ser sînga cîhanê rûnê. Dengê lingên hespa wê roj bi roj nêz dibû.

Gundî jî di van şevên dirêj de hema hema her şev li mala gundiyekî kom dibûn. Di van şevbuhêrkan de dihatin ba hev. Carcaran li ser pirsgirêkên gund, parvekirina agahiyek nû, piranî jî ji bo şeveke xweş derbas bikin dihatin ba hev. Bi gelemperî di van şevên dirêj de lîstikên wek diz û gundî, gustîlk dilîstin. Gelek caran jî ev şev bi çîrok çîrçîrok, henek, qerf, mamik, bi pêşbazî û tiştên din derbas dikirin.

Îşev wê civat li mala xalê Mehmûd kom bibûna. Xalê Mehmûd yekî xwîngerm û xweşsohbet bû. Ji xeynî van şevên dirêj jî civata wî tim geş bû. Mêvan ji mala wî kêm nedibûn. Bi vê xweşhaliya xwe di nav şêniyan de ji xwe re ciyekî taybet çêkiribû. Loma ji gundiyan kî şîva xwe dixwar, bê sekin radibû û ber bi mala xalê Mehmûd ve bi rê diket. Êdî bi qasî nîv saetî saetek li ser şîvê derbas bibû. Ji niha ve hemû rihspiyên gund û çend jî zarok li wê menzela mezin amade bûn.

Gava li ser pirsgirêkên gund an jî di der heqê jiyana rojane de nîqaş dikirin, li gorî şevên din ev ji bo van zarokên biçûk dibû xedarî û bêrehmiyek mezin. De îcar sihûd çawa li rûyê wan keniya. Hin zarokên biçûk bi destê bavê xwe digirtin û dihatin. Zarokên hinek din mezin bûn ji bo alîkariya malbatê, hinek ji wan jî ji bo xwe wek endamên civatê bidin qebûlkirin dihatin. Bi gotineke din dixwestin şekalên xwe têxin nav solên camêran. Loma di şevbuhêrkan de dixwestin kom bibin. Ev tişt her çiqas ji bo alîkariya mazûvan be jî ji aliyê din jî di aliyê civakbûyînê de dibistanek mezin jî bû. Di van şevan de gelek tiştan hîn dibûn. Ev dibistan di heman demê de li cîhanê dibistana herî kevin bû. Rêbaz û rêgezên vê dibistanê bi hezar salan berê ji aliyê civaka xwezayî ve hatibû avêtin.

Menzela ku lê rûniştibûn bi dûyê titûna qaçax tije bûbû. Ji niha ve wisa bibû ku çav çavan nedidîtin. Ji alîkî ve çaya ku ji binxetê hatî, ji alîkî ve titûna xursê û gurmegurma soba êzingan... Îşev her tişt li gorî dilê mêvan û mazûvanan bû.

Piştî ku çaya xwe vexwarin qederek şûnde Şikriyê kurê Selamo û du hevalên wî di destê wan de sêniyên tije mewij, nokên di nav sîlikê de hatine çêkirin, bastêq, kakilên gûz û behîvan ketin hundir. Sêniyên di destên wan de bûn bi awayekî hurmetkar danîn ber mêvanan. Xwelîdankên bi xwelî û bacikên cixareyan tije bûn vala kirin û çûn ber deriyê menzelê li ser çokan rûniştin. Rûspî û sermiyanên gund jî di navbera xwe de xeber didan, carcaran jî destên xwe dirêjî sêniyên bimewij û behîvan tije bûn dikirin, diavêtên devê xwe.

Bi têra dilê xwe çay vexwarin, mewij û kakilan xwarin. Êdî herkes li benda ew saeta pîroz bûn. Ev kelecana wan tu car nedihat gotin. Lê belê te digot qey di hin tiştan de şêniyên gund di nav xwe de peyamek veşartî xistine meriyetê û li gorî wê tevdigerin. Îşev jî xuya bû ku yek ji wan şevan bû. Ew menzela ku dengê tu kesî nedigihîşt ê din, ji nişka ve ketibû nav bêdengiya mirinê. Ev bêdengbûn ji bo xalê Cemîl bibû nîşaneya destpêka çîroka nîvcomayî. Wê serpêhatî ji nû ve dest pê bikira.

Gava bêdengbûn ji nişka ve dest pê kir xalê Cemîl jî ev fermana veşartî girt. Du – sê caran li ser hev bû kuxtekuxta wî. Beriya dest bi xeberdanê bike, wekî her carê qirika xwe paqij kiribû. Hêdîka li derdora xwe mêze kir. Hemû çav li ser wî bûn. Li devê wî mêze dikirin. Tu kes nedixwest gotinên ku wê ji deva derkeve birevîne. Îşev wê dawî li çîroka xwe bianiya. Loma jî ji hemû wan şevên din baldartir bûn.

Xalê Cemîl jî di bin giraniya vê de çavên xwe li ser civata ku li menzelê amade bû gerand. Çavên wî hat li ser Şikriyê kurê Selamo sekinî. Şikrî û hevalên wî li dawiya tevan, li ba derî, di nav pêlavan de rûniştibûn. Lê belê ji ber ku ewqas ji dil ji bo guhdarîkirinê xwe amade kiribûn te digot qey li pêşiya tevan rûniştiye. Xwe ji zû ve amade kiribû ji bo guhdarîkirinê.

Xalê Cemîl gava ev rewşa wî dît kêfxweş bû. Di dilê xwe de got; "Waye yên li pey me werin hene. Ev çanda me ya qedîm heta ku yek ji me hebe wê bidome. Ew ê ji nifşek bigihîje yeke din. Heke di demên pêş de ez jî hinek bi wî re eleqedar bibim, wisa bawer dikim ku di demên pêş de şagirtek baş wê ji wî derkeve."

Di bin giraniya çavan de cara dawî qirika xwe paqij kir. Cixareya ku du deqe berê pêçabû pêxist û dest bi xeberdana xwe kir. Hevok yek bi yek ji deva derdiketin. Kîjan çîrok dibû bila bibûya, navber li ku dabû ji bo xalê Cemîl ferq nedikir. Destpêk yek bû. Û waye dest pê kiribû. Bi wan hevokên xwe yên nemir wek ku xalîçokek hevrîşim hûr hûr birêse tevdigeriya.

Rojek ji rojan rehma xwedê li ser dayik û bavên hazir û guhdaran. Hebû tunebû, cengawerek bi navê Ristemê kurê Zal hebû. Ev cengawerek wisa bû ku nav û dengê wî li hemû cîhanê belav bibû. Hemû kesan taybetiyek wî di xwe de didît. Wisa ku ji hemû cîhana Rojhilat ên bi nav û dengê wî nebihîstibûn, ên şerê di navbera wî û Tûraniyan de nizanîbû cenga, di navbera wî û kurê wî Sohrab de derbas dibû nizanibûn, wan ji seriyek sîr jî nedihesibandin.

Xalê Cemîl her ku xeber dida liv û tevgerên wî jî li gorî cengê an jî li gorî zehmetiyên ku rûbirû mabû diguherî. Ev tişt bandora xwe li ser gundiyên ku li wî guhdarî dikirin jî dida xuyakirin. Xalê Cemîl carna destê xwe wek şûr dihejand, ew jî wek ku bixwazin serê xwe ji derba şûr biparêzin paşve dikişandin. An jî gava gurzê xwe li nav pişta dijminê xwe dixist, ji wan çend kesan bê hemdê xwe destên xwe diavêtin pişta xwe.

Kêf û coşeke mezin hebû di nav şêniyên menzelê de. Gava şerê di navbera Ristem û şahînşahê Tûraniyan dest pê kir, teva bêhna xwe girtibû. Ditirsiyan bêhna xwe berdin. Heke yekî din ev rewşa wan bidîta wê bigota teqez ew jî di nav şer de ne. Lê di dawiya şer de gava Ristem şahînşahê Tûraniyan ji ser pişta hespê wî, ew avêt êrde, piyê xwe danî ser sitûyê wî, kêf û coşa wan gihîştibû lûtkeyê. Hemû kesên li wir bûn ev çîroka herî kêm sed car guhdarî kiribû. Lê dîsa jî bi xwe nikaribûn. Wek ku hê nû guhdarî dikirin. Çend kes bê hemdê xwe bi dengek ji kûrahiya dilê wan dihat wisa gotibûn, "Wey sihet xweş, te dilê me rehet kir."

Ev her çiqas çîrok be jî jiyanek di vir de jî heye. Û ev jiyan carna dibe bê rehim, çavsor û hemû êşan bi ser mirov de dibarîne. Kengî bihîstin Ristem û kurê wî Sohrab dest bi cengê kirine hinav li wan nema. Lewre piştî cengeke pir dijwar ku Ristem Sohrab têk biribû. Piştî wê cengê Ristem bi awayekî hîn bibû ku Sohrab ji xwîna wî nîvê dilê wî, kurê wî bû. Ev agahî bask li wî şikandibû. Gundî jî wek Ristem baskşikestî û sitûxwar bibûn. Wek Ristem şîna Sohrab girtibûn.

Dem derbas dibû. Ji dûr ve dengê hewtehewta kûçikên gund dihat. Û xalê Cemîl hêdî hêdî ber bi dawiya çîroka xwe ve dihat. Bîstek din wek her tiştî ev çîrok jî bi dawî bibû. Xalê Cemîl gava bêhneke kûr kişand û got; "Ev çîroka me çû deştê, dê û bavên guhdaran jî cih bihiştî" ev dihat wateya ku ev çîrok jî xelas û bi dawî bûye. Lê belê li rexmî van gotinan civatê hê jî li devê wî mêze dikir, ka ew ê tiştek din bêje an na. Xalê Cemîl ji dêvla xeber bide dest avêt titûna li ber xwe. Ji xwe re cixareyek pêça. Pêxist. Dûman kişand nav kezeba xwe. Dîsa kuxikek dest pê kir. Dengê gundiyan ên digotin "Sihetxweş, her hebî " digihîşt guhê wî. Li ser bêdengmayîna xalê Cemîl wan jî êdî qebûl kiribû ku çîrok bi dawî bûye. Êdî gihîştine dawiya şeveke din.

Wê demê êdî Şikriyê kurê Selamo xwe negirt. Rabû ser xwe, ji dawiya menzelê hat, xwe avêt destê xalê Cemîl. Bi her du destan destê wî girt. Û çend caran li ser hev ma-çî kir. Wisa xuya dibû ku pir zêde di bin bandora çîrokê de maye. Ji kelecanê nizanibû çi bike. Dixwest xeber bide lê belê ji kelecanê nikaribû xeber bide. Dema hinek hat ser hemdê xwe serê xwe xwar kir, bi dengekî hurmetkar lê bi kelecanî got; "Xalê Cemîl ez dikarim di der heqê çîrokê de tiştek ji te bipirsim?"

Xalê Cemîl jî li wî mêze kir. Destê xwe di serê wî da. Û di dawiyê de got; "Belê Şikrîcan. Tu dikarî pirsek ji min bikî. De ka bibêje tu yê ji xalê xwe çi bipirsî?" Gava Şikrî dest bi xeberdanê kir û pirsa xwe pirsî, xalê Cemîl li ciyê xwe sor bû, reş bû, şîn bû. Rengê wî ji rengekî çû ser rengekî din. Lê belê ji ber ku zarok bû nedixwest dilê wî bihêle. Wî ji xwe sar bike. Di dawiyê de dîsa ket navberê û got; "Belê Şikrîcan te yê çi bipirsiya?"

Li ser vê pirsê Şikrî got; "Xalê Cemîl bi rastî ev hefteyek e tu ji me re çîroka Ristemê Zal dibêjî. Û çîrokek ewqas xweş heta niha min li tu deverî gudarî nekiribû. Lê di vê çîrokê de tişta min fêhm nekir ev bû. Ev Ristemê Zal mêr bû an nêr bû. Heke te di destpêka çîrokê de vêya jî bigota wê baştir nebûya gelo?"

Xalê Cemîl dema van gotinên dawî bihîst êdî xwe negirt. Devê xwe vekir û xwest çi were ber deva bibêje. Lê belê bi zehmetî be jî xwe girt. Dengê xwe nekir. Sola xwe kir piyê xwe. Beriya ku di tariya şevê de, di bin ewrên reş û tarî de wenda bibe careke din destê xwe di serî da û got; "Ew jî wek te mêrek ji mêran e. Û di tariya şevê de wenda bû." Şikrî bi wan çavên xwe yên beloq li wî mêze kir. Hewtehewta kûçikên gund tariya şevê kûrtir dikir.

rupel 6++.qxp_Layout 1 4.09.2020 19:38 Page 1



Fransayê zor daye dîplomasiyê

Navenda Nûçeyan

Demên dawî Fransayê dîplomasiya xwe ya li Rojhilata Navîn zêde kiriye. Wekî tê zanîn piştî ku li Sûriyeyê zêde ji xwe re cih nedît ji ber ku ew di navbera hêzên wekî Rûsya, Îran, Tirkiye û Amerîkayê de hatibû dabeşkirin. Niha Fransayê giraniya dîplomasiya xwe daye ser Libnan û Iraqê, her wiha di aloziya rojhilatê deryaya Spî de jî li ba Yewnanistanê cih digire.

Beriya demekê bo cara duyemîn serokê Fransayê Emmanuel Macron, serdana Libnanê kir û ji wir peyamek da rêveberiya Libnanê ku heta ew dest bi sererastkirinên siyasî nekin, Fransa dê wan sozên xwe yên ji bo alîkariyê pêk neyne. Her wiha piştî wê berê xwe da Iraqê û li wir bi rayedarên hikûmeta Iraqê re hevdîtin pêk anîn.

Macron, serokê Fransayê di civîna çapemeniyê de li gel Mistefa Kazimî, serokwezîrê Iraqê ragihand: "Xebatên me berdewam in, bi taybetî li ser çend mijaran ku mayeya girîngiya me ye li Şingal û der barê êzidiyan de." Macron di beşeke axaftina xwe de diyar kir: "Fransa teqezî li pabendiyên li hember Iraqê dike ji bo dostaniya di navbera her du aliyan de û xebata di navbera her du welatan de. Ev jî ji bo çespandina demokrasiyê ye li Iraqê. Me li ser rewşa niha gotûbêj kir. Teqezî li ser bihêzkirina hevkariyên li hemû waran hat kirin."

Serokê Fransayê destnîşan kir: "Li ser çend mijaran ku mayeya girîngiya me ye li Şingal û der barê êzidiyan de, xebatên me berdewam in. Em ê di warê tendirustî û mirovî de jî alîkar bibin. Em pabendiyên xwe didomînin. Bi taybetî di rûbirûbûna DAIŞ'ê de ku Fransa ji destpêkê ve di şer de beşdar e û vî şerî gelek êş aniye Iraqê û şerê li dijî DAIŞ'ê hê jî berdewam e."

Mistefa Kazimî, serokwezîrê Iraqê jî spasiya piştevanî û alîkariyên Fransayê kir û got: "Em ê peywendiyên xwe yên ligel Fransayê di hemû waran de bi pêş ve bibin." Kazimî diyar kir ku Fransayê di avakirina deverên zirardîtî de gelek alîkariya me kir, bi taybetî di projeyên Balafirgeha Mûsilê û jinûve avakirina Şingalê de.

Serokwezîrê Iraqê aşkera kir ku ew li ser enerjiyê û alîkariyan axivîne, bi taybetî enerjiya atomî bi serperiştiya Ajansa Enerjiya Atomê, ji bo berhemanîna enerjiya ceyranê. Her wiha got ku ew ê hewl bidin ku astengiyên li ber kompaniyên fransî ji holê rakin û ji bo wan hêsankarî bikin.

Macron, di gera xwe ya li Bexdayê de hevdîtin bi serokomarê Iraqê Berhem Salih, serokê herêma Kurditanê Nêçîrvan Berzanî û gelek rayedarên din ên Iraqê re kir.

Hesabên li ser Şengalê

Ji aliyekî din der barê hesabên li ser Şengalê roj bi roj derdikeve holê ku hevkariyek û planek mezin li ser Şengalê tê kirin. Serokwezîrê Iraqê Kazimî tevî heyeta pê re hefteya derbasbûyî li Washîngtonê hevdîtinên fermî kirin. Piştî civîna destpêkê ya rûbirû ku di çarçoveya 'Diyaloga stratejîk a DYA-Iraq'ê pêk hat, Wezareta Karên Derve ya DYA'yê bi rêya telekonferansê têkildarî mijarê brîfîngeke taybet bi rêya çapemeniyê da. Di vê brîfîngê de têkildarî êrişên hewayî yên dewleta tirk ên li ser Şengalê pirsek li Alîkarê Yekemîn ê Wezîrê Karên Derve yê DYA'yê ji Karên Rojhilata Navîn a Nêz Berpirsyar Joey Hood hate kirin. Bersiva ku Hood da balkêş bû. Hood qet qala êrîşên hewayî nekir û got, divê Şengal 'PKK jî di nav de ji milîsên çekdar bê paqijkirin' û li şûna wê 'îdareyeke sivîl' bê avakirin û ji bo jê jî xwest Hewlêr, Bexda û Enqere' di bin şêwirmendiya DYA'yê de bi hev re bixebitin. Yanî bang li Hikûmeta Herêma Kurdistanê (PDK), hikûmeta Iraqê û dewleta tirk kir ku di bin kontrola DYA'yê de dest li Şengalê werdin. Ne tenê bang kir, di heman demê de îlan kir ku ji bo vê yekê xwedî hesab û planên şênber e.

Rageşiya li deryaya Spî

Navenda Nûçeyan

Li hemberî israra Tirkiyeyê ya berdewamkirina binpêkirinên li rojhilatê deryaya Spî, Ewropayê bi rêya niyeta xwe ya ferzkirina cezayan û tevgerên Fransa-Yewnistanê yên pêşîgirtina planên Tirkiyeyê li deryaya Spî, bersiveke hişk da. Di heman demê de, Yewnanistanê hejmareke mezin a keştî û noqavan şand deryaya Spî û deryaya Îcayê. Her wiha hêzeke deryayî ya zêde şand girevên nêzî girevên girêdayî Tirkiyeyê, da ku di dema rûdana şer de biparêze. Her wiha li Yewnanistanê behsa kirîna balafirên şer ên Fransayê yên cureya "Rafale" dihate kirin.

Tevî ku Tirkiye li ser gefên Ewropayê paşde vekişiya jî lê medyaya tirk dest bi belavkirina propagandaya komployên li dijî Tirkiyeyê kir. Dezgehên çapemeniyê yên girêdayî dewletê ji bo wê erkê bi kar anîn, da ku bi hestên gel bilîze û piştgiriya gel ji bo derxistina şer li rojhilatê deryaya Spî bigire.

Îtalya, Fransa, Başûrê Qibrisê û Yewnanistanê ragihandibûn ku dê hemwextî çalakiyên Tirkiyeyê yên lêgerîna li gazê li herêma rojhilatê deryaya Spî, perwerdeyên leşkerî yên hevbeş li heman herêmê dest pê bikin.

Tirkiye gav paşde avêt

Di encama helwesta Yekitiya Ewropayê de ya piştgiriya Yewnanistanê, Tirkiye neçar ma ku gavan paşde bavêje û amadebûna xwe ya ji bo diyalogê destnîşan bike. Têkildarî rageşiya li deryaya Spî rojnameya El-Ereb jî di şîroveyeke xwe de wiha behsa vê mijarê kir: "Yewnanistan û dewleta tirk, li ser pêkanîna dan û standinan li hev kir ji bo ku asta rageşiya leşkerî ya li deryaya Spî sivik bikin."

Sekreterê giştî yê NATO`yê Jens Stoltenberg ragihand ku Yewnanistan û dewleta tirk têkildarî vê rageşiyê dê li navenda NATO`yê dest bi diyalogê bikin. Ji ber her du welat der barê sînorên deryayî û mafên lêgerîna gazê de li hev nakin.

Jens Stoltenberg duh gotibû ku Yewnanistan û Tirkiye ku her du endamên NATO`yê ne, têkildarî nakokiyên der bare madeyên enerjiyê yên li herêmê li hev kiriye û ji ber vê yekê ew ê bikevin diyalogê.

Her wiha daxuyandibû ku piştî dan û standina bi serokên Yewnanistan û Tirkiyeyê re her du welatan li hev kir ku divê li navenda NATO`yê dan û standin çêbe û mekanîzmayên pêşî li xetereya rûdana bûyerên li deryaya Spî derkevin holê.

Ev diyalog piştî wezîrê karên derve yê Amerîkayê Mike Pompeo têkildarî vekirina rêyên dîplomatîk û sivikkirina nakokiyên her du aliyan hişyar kir, pêk hat. Ji ber van nakokiyan Yekitiya Ewropayê û dewletên nêzîkî herêmê neçar man destwerdanê bikin. Yewnanistan, Îtalya û Fransayê ku her sê endamên NATO`yê ne, li heman herêma deryaya Spî tetbîqat li dar xistin û Tirkiyeyê jî tetbîqatên deryayî li dar xist.





Mem Avba

Qebûlkirina statuya Şengalê yan dubarekirina fermanan!

Dema navê Şengalê tê gotin, trajediya mezin, Fermana 73'an a di serê civaka êzidî de pêk hatî tê bîra mirov. Şengal di sala 2014'an de rastî hovîtiya mezin a DAIŞ'ê hat. Ji her alî ve bi hilweşîneke mezin re rû bi rû ma lê vê civakê li ser xweliya xwe, bi bîrdoziya Tevgera Azadiyê xwe ji nû ve afirand.

Piştî têkbirina DAIŞ'ê li Şengalê bi pêşengiya civaka êzidî pêvajoyeke nû dest pê kir. Di serî de ji aliyê ewlehî û parastinê ve, Meclisa Avakar, gelek sazî û dezgehên rêxistinkirina civakê hatin avakirin. Saziyên xizmetguzariyê, saziyên jinan ên xweser, ên ciwanan, ên aborî, perwerdehî, siyasî hwd di gelek qadan de civakên Şengalê dest bi nû ve avakirina xwe kir.

Bêguman ev sazî û dezgeh çiqas xwedî naverok û karîgeriyeke dagirtî û encamgirtinê mijareke cuda ye lê belê babeta me êrîş û provakasyonên li hemberî vê sîstema rewabûna xwe ji civakê digire, tên lîstin!

Di serî de welatên ewropî, nexasim Almanya, Birîtanya, Fransa, Amerîka, Kanada û Ewûstralya yên qaşo xwe weke alîgir û rizgarkerê mafê mirovan nîşan didin, ji destpêkê ve hewl dan ku ev civak ji warê xwe koçber bibe, tûşî qirkirinê bibe! Dema ku dîtin pêk nayê, serî li rêbazên cuda dan. Bi riya sazî û dezgehên ku rol û mîsyona sîxuriyê dilîzin, hewl dan bi rêbaz û derfetên madî rêxistingeriya li Şengalê bi bedelên giranbuha pêk hatî belav bikin û civakê dîsa weke berê bê parastin û bê rêxistinî bihêlin. Ji bo wê demeke ku bi van rêbazan dest davêjin kesên di nav saziyên Rêveberiya Xweser a Şengalê de cih digirin û hewl didin wan bi rojevên sexte re mijûl bikin.

Bêyî ku li ser parastin, rêxistinkirin, rêvebirin û pêşxistina vê civakê gotin û angaşteke van derdoran hebe, bi van rê û rêbazên kirêt dixwazin civakê ji daxwazên xwe yên pîroz dûr bixin. Bi vî awayî li ser daxwazên rewa û mafdar ên civaka êzidî tê nixumandin û berovajîkirin.

Her kes vê rastiyê baş dizane, ji bo ku ev civak ji aliyê feraseteke serdest û derveyî dihat rêvebirin bi komkujiyan re rû bi rû ma. Kar û barê van sazî û dezgehên noker jî ew e ku nehêlin civak bibe xwedî îrade, xwe bi xwe biparêze, bi rê ve bibe û tim û tim derî ji metirsiya fermanan re vekirî bimîne!

Ev nêzikatî sala par dema keça êzidî Nadiya Mûrad ku di Neteweyên Yekbûyî de weke 'Qasida Aştiyê' hatiye payekirin, dema çû ba serokê Amerîkayê Donald Trump û behsa komkujiya civaka êzidî kir. Trump xwe kor û ker û lalbûnê danî û civaka êzidî ji nedîtî ve hat lê belê heman Trump îro radibe dibêje 'bila li Şengalê rêveberiyeke sivîl û rewa bê çêkirin!' Ev bi aşkera êrîşeke li dijî îrade, hebûn û nirxên civaka êzidî ye. Çimkî rêveberiya niha ya li Şengalê, ji xelkê ku li dijî DAIŞ'ê têkoşîn kirî, bedel dayî û li ser wan nirxan hatî avakirin pêk tê.

Dewleta Iraqê ji dema fermanê heta niha ev îrade nas nekiriye û ji bo ku ev civak birînên xwe bipêçe gaveke tenê jî neavêtiye; xizmeteke biçûk ji bo vî gelî nekiriye. Ne ew kesên ku destê wan di kuştina êzidiyan de heyî hatine dadgehkirin, ne jî ev komkujî di asta Iraqê de qebûl nekiriye û li hemberî sûcên şer di asta navneteweyî de nebûye xwedî hewldan û helwest! Heta li hemberî êrîş, destdirêjî û hewldanên dagirkeriya dewleta tirk ên li dijî Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) bertek û helwestên wê ji gotinan wêdetir neçûye.

Di van demên dawî de Muhafizê Mûsilê û Berpirsê Odeya Operasyonê yê Neynewayê çûn Şengalê û diyar kirin ku hêzên li Şengalê heyî bên belavkirin! Heta bi destê hin derdorên hevkar û noker ên di xizmeta dagirkerên herêmî û navdewletî de ne, dixwazin nakokî, fitne û fesadiyê di nav civakê de çêkin, civakê bînin berambera hev û vê sîstema ku bi berdêlên giranbuha hatî avakirin, bidin hilweşandin..!

Gava mirov bi vê perspektîfê rewşa herêmê deyne holê, tê dîtin ku ti hêzên herêmî, navdeweletî; dewleta Iraqê û hinek pêkhateyên herêmê ku behsa wan hatî kirin jî ji ber berjewendiyên xwe yên tarî, neyartiya vê pergal û statuya bi pêşengiya Tevgera Azadiyê pêş ketî dikin.

Ji bo wê yekane riya ku ev statuya li Şengalê bi pêş ketî mayînde bibe, hevgirtin û tifaqa pêkhateyên herêmê û bi taybetî jî ya civaka êzidî bixwe ye. Di heman demê de ji bo parastina ewlehiya civaka êzidî pêwîstiya yekrêzî, yek-helwestî û giyaneke neteweyî ya gelê kurd bi giştî heye. Çimkî siyasetên parçeyî weke di tevahî mijarên neteweyî de di vê mijarê de jî ji xizmeta zilhêz û dagirkeran wêdetir bi kêrî tiştekî nayê…

rupel 7++.qxp_Layout 1 4.09.2020 19:40 Page 1

Muzakereya MSD û Partiya Vîna Gel

Meclisa Sûriyeya Demokratîk û Partiya Vîna Gel têkildarî çareseriya siyasî peyameke lihevkirinê ya hevbeş îmze kirin û ev yek ji bo lihevkirineke navxweyî wekî gaveke mînak û di cih de ye

Bendên sereke yên vê lihevkirinê wiha hatin ragihandin: Rewşa heyî û aloziya Sûriyeyê ya ketiye sala 10'emîn, piştrast dike ku ev alozî aloziyeke bingehîn e. Her wiha destwerdanên derve alozî zêdetir kûrtir kir û hemû vebijêrkên ewlehî û leşkerî bê wate man.

Li pêşberî rewşa trajedîk û azarên ku gelê Sûriyeyê wekî kuştin, girtin, revandin, koçberkirin û rewşa jiyanî ya xerab, li gel şerê ku binesazî û binesaziya civakî wêran kiriye, êdî pêwîst e ku tevahî hêzên neteweyî yên demokratîk ji bo bidawîkirina vê trajediyê û rûxandinê tev bigerin.

Wek berpirsyariyeke dîrokî li hemberî karesatên ku herêm û welatê Sûriyeyê tê re derbas dibe, her wiha ji bo pêkanîna guhartina bingehîn a demokratîk, siyasî, aborî û civakî, MSD û Partiya Vîna Gel li hev civîn û muzakereya lihevkirinê îmze kir. Xalên bingehîn ên muzakereyê wiha ne:

1. Di Sûriyeya nû de, xak û gelê Sûriyeyê yek in. Sûriyeya nû dewleteke demokratîk e û tê de wekhevî û edaleta civakî heye û bi tevahî pêkhateyên xwe yên kurd, ereb, suryan, aşûr, tirkmen, ermen û çeçen serbilind e. Di pirrengiya nasnameyan de hêmana dewlemendiyê de yekitî û hevgirtina civakî xurttir dike. Her wiha destûra wê ya demokratîk formeke pêşketî ya têkiliyên nenavendî, birêvebirina gel a desthilata yekser li herêman û dewlemendiyên heyî bi awayekî adilane li tevahî welat pêk tîne. Her wiha karên bingehîn mîna karên derve, parastin û aborî, bi awayekî wekhev tên birêvebirin.

2. Çareya siyasî deriyê yekane yê bidawîkirina aloziya Sûriyeyê ye. Her wiha ew çareya ku xwe dispêre serweriya gel a bi hemû pêkhate û mafê wan ên diyarkirina çarenûsê bi rêya diyalogê.

Di vê çarçoveyê de, her du alî piştgiriya pêkanîna biryara bi hejmara 2254'an bi giştî dikin ku di nav de pêkanîna daxuyaniya Cinêvê û tevlêkirina aliyên opozîsyonê û di nav de MSD'ê û aliyên siyasî yên Sûriyeyê re. Ji ber ku ev biryar rêya rizgarkirina mafên gelê Sûriyeyê di vegerandina serweriya Sûriyeyê de, bidawîkirina tevahî ceza û şêweyên dorpêça li ser gelê Sûriyeyê ferzkirî, siyasetkirina alîkariyên mirovî, bidawîkirina dagirkeriyê û şêweyên destwerdanên derve û derxistina tevahî hêzên biyanî ji xaka Sûriyeyê ye.

3. Dewleta welatîtiyê ya wekhev li Sûriyeyê teqeziyê bi pirrengiya civaka Sûriyeyê, neçarkirina dîtina çareyên demokratîk û adil ji doza kurd li Sûriyeyê re li gorî pîvan û qanûnên navneteweyî û mafên wê yên destûrî dike. Her wiha di dewleta welatîtiyê de mafên neteweyî yên tevahî pêkhateyên Sûriyeyê di yekitiya Sûriyeyê û serweriya wê de parastiye.

4. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêwîstiyek e û pêdiviyeke civakî ya girêdayî rewşa welêt e. Her wiha ji bo bidawîkirina aloziyên heyî pêwîstiyeke herêmî ye. Ya girîng divê ji tecrubeya Rêveberiya Xweser bi erênî û neyînîya wê sûd jê were girtin, nexasim di şêweyên rêveberiya gel li herêman. Divê li ser asta neteweyî ya giştî û di çarçoveya lihevkirina di navbera gelê Sûriyeyê de bi pêş bikeve, da ku yekitiya xaka Sûriyeyê, serweriya wê û pergala rêveberiya giştî xurt bibe.

5. Artêşa Sûriyeyê, saziyeke neteweyî ya giştî ye, tenê bi rakirina çekan ve girêdayî ye û destwerdana siyasetê nake. Divê HSD ya bi awayekî cidî rola xwe di şerê li dijî terorê de lîstiye û hê jî li ser xurtkirina jiyana hevbeş dixebite, li ser bingeha form û mekanîzmayên lihevkirinê tev li vê saziyê bê kirin.

Li gorî vê, her du aliyan li ser xurtkirina peywendî û hevkariya li ser asta siyasî ya giştî û asta xebata yekser, li hev kir. Her du aliyan piştrast kir ku pêwîst e xebata hevbeş ji bo garantiya beşdariya MSD'ê di xebata siyasî ya tevahî hûrgiliyan de pêk bê û beşdarî komîteya destûra Sûriyeyê bibe.





Li Başûr qeyrana aboriyê

Li başûrê Kurdistanê her diçe rêjeya bêkariyê zêde dibe, di ser de jî hikûmet di dema wê de muçe nade, muçeyê dide jî ji sedî 21'ê wî kêm dike. Ev rewş bandoreke neyînî li gel kiriye.

Di nav 9 mehên dawiyê de tenê muçeyê sê mehan li başûr hatiye belavkirin. Ji van sê muçeyan jî du muçe ji sedî 21'ê wî hatiye kêmkirin. Derfetên kar jî ji ber tedbîrên virûsa koronayê kêm bûne. Ev rewş jî bandorek neyînî li ser jiyana rojane ya welatiyan kiriye.

Li gorî amarên Desteya Amaran a Herêma Kurdistanê, îsal ji ber ragihandina qedexeya hatin û çûnê ji sedî 41,8'ê welatiyan bê kar mane. Her wiha ji sedî 73,4'ê welatiyan jî pirsgirêkên aborî dijîn. Ev tenê ew amar in ku desteyê tomar kirine. ***HEWLÊR***



'Gel aştiyê dixwaz e'

Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), encama "Bernameya Têkoşîna Demokratîk" a bi armanca hemû beşên civaka demokratîk ên li Tirkiyeyê bîne gel hev dest pê kiribû, bi "Deklarasyona Banga Ji Bo Aştiyê" hefteya borî aşkera kiribû.

Di deklarasyonê de hat ragihandin ku israra polîtîkayên şer, neceribandina polîtîkayên aştiyê şaşitiyeke mezin e û wiha hat gotin: "Pêwîstiya me bi aştiyê, bi diyalog û danûstandinan heye. Mîna xaka ku bi hesreta avê ye, welatê me jî bi hesreta polîtîkayên aştiyê ye. Mirovên demokrat û yên li paşeroja hevpar a vî welatî difikirin, nabe ku vê rastiyê ji nedîtî ve bên. Weke ku bûyerên diqewimin nîşan didin, pirsgirêk êdî ji sînorên welat jî derbas kiriye, bûye xwedî aliyekî herêmî û global. Heta ku neçareserî dewam bike, heta ku dînamîka şer zindî be wê Tirkiye her tim ji aliyê siyasî û aborî ve bi hêzên global ve girêdayî be, hewcedarê wan be. Halbûkî ev pirsgirêk bi esasî pirsgirêka me ye û divê li vî welatî bê çareserkirin."

Di deklarasyonê de behsa çareseriya pirsgirêkê jî hat kirin û wiha hat diyarkirin: "Ji bo çareseriya pirsgirêkê berpirsyariyeke girîng dikeve ser milê muxalefeta siyasî û civakî, ji ber ku meseleya kurd meseleyeke jiyanî ye nabe ku ji însafa desthilatdarî û dewletê re bê hiştin. Partiyên muxalefetê divê daxwazên gelê kurd ên ji bo maf û azadiyê weke beşek ji armanca jiyana wekhev û hevpar û demokratîkbûna Tirkiyeyê bibîne. Ev pirsgirêk nabe ku tenê weke pirsgirêka kurdan û HDP'ê bê dîtin. Heke ji bo aştiyê em bi hev re tênekoşin em ê nikaribin aştî, demokrasî û azadiyê bi dest bixin."

ENQERE



Xweşkanî

Felemez Ulug

PKK hincet e

Di van rojan de bûyer û pêşveçûnên li Kurdistanê diqewimin bi her awayî girîng in. Ev bûyer û pêşveçûnên bi destê hêzên derve tên bipêşxistin ji bo gelên herêmê metirsiyek mezin didin avakirin. Bi taybet hêzên mîna Amerîka û hêzên koalîsyonê ji bo hebûna xwe li herêmê berdevam bikin û ji derveyî îradeya wê gûhertin li herêmê çênebin bi lîstik û komployan ve her tim mûdaxeleyî herêmê dikin. Lewma mirov nikare bêje pêşveçûnên niha li herêmê, bi taybetî jî yên li başûr Kurdistanê, Şengal û Rojava diqewimin ji derveyî îradeya van hêzan bi pêş dikeve.

Ji despêkê ve Amarîka li herêmê hebûna hin hêzan ji xwe re xeter dibîne. Ev hêzên ku bi îrade û tifaqa gelan ve derketin holê û di van çend salên dawî de bi têkoşîn û berxwedana li dijî çeteyên DAIŞ û hêzên dargirker dan meşandin ve ji hêla hemû aliyên demokratîk û aştîxwaz ve hatin xelatkirin îro di hedefa van hêzên komprodor de ne. Ji ber vê yekê pêwîst e mirov gotinên rayedarên Amarîka yên der barê herêmê de tînin ser ziman bi baldarî bişopîne.

Ji ber ku dewleta tirk jî bêyî ku ji Amarîka destûr bigire ne gengaz e ku bikaribe êrîşî axa Iraq û rojavayê Sûriyê bike. Di van êrîşan de wisa diyar e ku bi her awayî PDK jî îkna kirine. Lewma di her kêliyê de rayedarên PDK'ê bi zimanê hêzên dagirker diaxifin û dibêjin; "Bila PKK û HPG ji axa başûrê Kurdistanê derkevin." Bi vê nêrînê ve PDK bi temamî xwe ji azadiya Kurdistanê qut dike û hevkariya xwe ya bi hêzên dagirker re aşkera dike. Lewma di nirxandinên xwe de mirov êdî nikare PDK û hêzên dargirker ji hev cuda bigire dest.

Di çarçoveya peymanên dewleta tirk ên bi PDK'ê re îmze kirine artêşa tirk nêzî 40 baregehên leşkerî li başûrê Kurdistanê ava kirine. Ev jî bi awayekî aşkera radixe ber çavan ku başûrê Kurdistanê bi tamamî ji hêla dewleta tirk ve hatiye dagirkirin lê mixabin yên pêşî li vê dagirkeriyê vekirine jî hêzên mîna PDK'ê ne yên ji vê dagirkeriyê sûd werdigrin. Bi van pêşketinên heyî ve mirov êdî nikare qala yekitiya neteweyî jî bike. Ji ber ku di vê rewşa heyî de yekitiya neteweyî domandin û veşartina xiyaneta PDK'ê dike. Ev hevkariya PDK'ê di nav civakê de mijarek zindî ye lewma bi hêzeke wisa di nav hevkariyê de hatiye strandin ve negengaz e ku yekitiya neteweyî bi pêş bikeve.

PDK di xebata xwe de nikarî him kurdîtiyê bike û him jî bi dewletên dagirker re di nav tifaqê de be. Pêwîst bû ku ji van herdûyan yekê hilbijêre. Lewma ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî û malbatî rêvebiriya PDK'ê riya hevkariya bi dewleta tirk re hilbijart. Ji ber vê her tim dûrî xeta yekitiya neteweyî disekinîn û ji bo ev yekitî pêk neyê hincetên cuda ava dikirin.

Gotinên mîna "ger PKK neba dê dewleta tirk êrîşî başûr nekira", "tu pirsgirêkên dewleta tirk bi kurdên Rojava re nîne", "ger PKK neba dê Tirkiye Rojava dagir nekira." Hewildanên şibandina hev a PKK û PDK ne. Ji ber ku yên van gotinan bi lêv dikin ne kesên ji rêzê ne. Lewma pêwîst e mirov lîstikên li ser hebûna kurdan tên lîstin baş bibîne.


Bêguman ev bûyerên di pêşengiya PDK'ê de li başûrê Kurdistanê diqewimin bi perspektîfên Amarîkayê ve bi pêş dikevin. Di vê der barê de çend roj berê rojnamevan Necmettîn Salaz di nivîsa xwe ya rojnameya Yenî Yaşamê de gelek agahiyên girîng par vekirin. Di nirxandina xwe de Salaz, bi perspektîfên Amarîka ve hevkariya PDK'ê ya bi hêzên dagirker û têkoşîna li dijî PKK'ê nirxandibû.

Di vê mijarê de Salaz cîh dide nirxandinên cîgirên berpirsyarê Rojhilata Navîn ê Wezîrê Karên Derve yê Amarîka Joey Hood û Davîd Kopley, "Hikûmeta hêrêma Kurdistanê, hikûmata navendî ya Iraqê û Tirkiye bi Amarîka û hêzên koalîsyonê re dikarin bi awayekî koordîne kar bikin. Di vê der barê de cihên mîna Şengal, di nav de hêzên mîna PKK'ê yên çekdar werin paqijkirin û ji bo aramiya herêmê rêvebiriyek sivîl bê avakirin. Bi pirsgirêka hebûna PKK'ê ya li bakurê Iraqê ve girêdayî em dixwazin bi Iraqê û Tirkiyeyê re kar bikin."

Wek di vê nirxandinê de jî derdikeve holê ku êrîşên dewleta tirk û hevkariya PDK'ê ji destpêkê ve ji hêla Amarîka û hêzên koalîsyonê ve hatine plankirin. Lewma ev êrîşên li ser kurdan bi pêş dikevin bi tamamî beşeke şikandina îradeya kurdan e. Ji bo di vê mijarê de bigihîjin armanca xwe PKK û hebûna wê ya li deverên cuda ji xwe re dikin hincet. Hemû gelên herêmê jî baş dizanin ku PKK bi tu awayî li ser jiyan û hebûna gelan ne metirsî ye.

rupel 8+.qxp_Layout 1 4.09.2020 19:41 Page 1

Têkilîya bîr û çandê




Nesîbe Guneyî

Bi salan civaknas qala ‘bîrê’ bi taybetî ji bo kesan kirine, lê belê piştî xebatên Maurice Halbwachs bîr bi civakê re hatîye nasîn. Xebatên di sedsala 20’an da li ser têkiliya çand û ziman ên Maurice Halbwachs, giringiya xwe heya îro didomîne. Xebatên wî di civaknasîyê da gelek tên nasîn; ew bi vê xebata xwe têkiliya civak û ‘bîra kollektîf’ dide nasîn. Ger em bixwazin ‘bîra çandî’ yan jî ji zargotinê fêm bikin divê em ‘bîra civakî’ binasin, ji ber ku peyv bi rêya hafizaya kolektîf hebûna xwe didomîne. Li gor Maurice Halbwachs; bîra kesan ji bêjinga bîra (serpêhatîyên) civakê derbas dibe. Bîra tu kesî bêyî serpêhatîyên civakê şêwe nagire. Kesek bê civak, bê bîr e jî. Bîra civakî di navbera paş û pêşiyê da pirek e. Bûyerên çandî, civakî, dîrokî radigihîne îroj. Beriya metnên nivîskî, berhemên folklorîk an jî cureyên zargotinê yên di tûrikê civakê da bi saya bîra civakî hatiye muhafazakirin an parastin. Bîr, mala hebûna çanda welatekî ye. Ger mirov bixwaze ji zargotinê fêm bike divê ji ‘bîra civakî’ fêm bike.

Halbwachs têkiliya bîrê wek mekanîzmayek girêdayî bi taybetmendiyên dem, cih û kesan ra pênase dike. Kesek têkiliya xwe yek ji van taybetmendiyan bêpar bihêle, hafizaya mirov çênabe. Divê bîr bi kesan, koman an bi civakek ra di têkiliyê da be. Wekî ku dapîr, bapîr, dengbêj û çîrokbêj çarçoveya bîrê bi vegotinên xwe turîkê bîrê dadigrin.

Jan Assmann xebatên Maurice Halbwachs berfirehtir dike û xebata xwe bi navê ‘bîra çandî’ tîne ser ziman. Li gor xebata Jan Assmann; “Bîr, zindî ye û hebûna xwe her tim di nav têkilîyê da (ragihandin, danûstandin) didomîne, ev danûstandin bisekine yan jî çarçoveya ku di nav da ye biguhere an wenda bibe jibîrkirin dertê holê.” (Jan Assmann Cultural Memory,r.41.)

Bi vegotina terma ‘bîra çandî’, çarçoveya bîrê ya ji derve ye tê qalkirin.Wekî ku em dikarin bêjin; ger bîr kakilê gûzê be bîra çandî jî qalikê gûzê ye. Yanî dema ku em dibêjin ‘bîr’, tiştê ku tê ber çav ji hundir ve ye û mala bîrê mêjî ye. Ji ber ku bîr bi psîkolojî û norolojîyê ve girêdayî ye lê belê civak û çand naveroka bîrê diyar dike. Bîra çandî, ji bûyerên qewimiye, ji rê û rêbazên van bûyeran û ji berhemên devokî şêwe digire. Wekî mînak çîrok, destan, zûgotinok hwd. Di bîra çandî da civak li gor şert û mercên heyamê, wê çi bîne bîra xwe diyar dike. Jan Assmann divê; bîra çandî bi awayek biyolojîk ji nifşan ra namîne, ji ber wê yekê her tim bi rêya dubarekirinê divê zindî were hiştin ku neyê jibîrkirin. Lewma hemû berhemên folklorîk di nav rojevê da ji nifşan ra bi dubarekirinê tê ragihandin.



Nasnameya mirov bîra mirov e. Kesek çawa nasnameya xwe bi hebûna bîra xwe ava dike, komek an civakek jî nasnameya xwe encax bi rêya bîrê ava dike. Ew bîra ku em li vir qal dikin bi awayek norolojik nîne. Wekî arşîvek normên zargotinê dewir dikin û ji bo were ser ziman em her car deriyê bîrê dixin.

Jan Assmann dema ku dibêje bîra çandî zindî bihêlin, ji bo zargotin- çanda devkî dibêje. Teoriya wî ya bîra çandî ji bo kesên ku ragihandin û danûstandinê bi rêya çanda devkî dikin weke dengbêj, çîrokbêj, zarbêj hwd. Ji destpêka jiyana me heya niha dayikên me dapîr û bapîrên me ji me ra çîrokan dibêjin. Mezinên me devê tûrikê zargotinê her carê ji bo me vedikin û em jî beriya nivîsê berhemên devkî bi vî awayî dinasin û bi vî awayî her carê ji bo nifşên din tê dewirkirin.



Ev cureyên folklorîk ên tên dewirkirin bi rêya zargotinê ‘bîra çandî’ çêdike. Jack Goody, di xebata xwe ya çanda devkî de dibêje: ger civakek xwendin û nivîsandinê nizanibe, zargotin ew tiştê ku hemû bi rêya ziman tê vegotin e, bi awayekî din jî ev hemû çand e. Cureyên zargotinê li gor wêjeya nivîskî tê dîtin ku li gel civakê zêdetir tê pejirandin. Ger derfeta nivîsê tune be jibîrkirin her tim mimkun e. Lêkolînerên wekî Barry Sanders û Jan Assmann di xebatên xwe yên çanda devkî da qala tiştên di vegotinê da tê jibîrkirin dikin. Dibêjin; her nifşek ji nifşek din ra zargotinê kêmtir vedibêje. Ev rewş jî roj bi roj wendabûna berhemên folklorîk ên orijînal bi xwe ra tîne.

Zargotin ji ber ku ji nivîsê bêpar e di bîra civakê da bi rêya dubarekirinê bi sed salan xwe bi pêş dixe û hebûna xwe di bîrê da bi cih dike. Hem pêşî hem paşîya wêjeya nivîskî serpêhatî û tecrûbeyên civakekê, bi rêya bîra hevpar tê parastin û tê vegotin.

Di destpêkê da, berîya her tişt peyv hebû. Dibe ku were gotin; nivîs tune be wêje û folklor jî tune ye lê belê bi vê gotinê hebûna kevneşopîyan, çanda muzîk, çîrok, destan, ango hemû folklora civakan tê înkarkirin. Serpêhatiyên gel di nav peyvan dijî. Di çanda devkî da ew kesek ku herî dirêj dijî, sindoqa zargotinê ye. Ji ber ku her tişt di bîra vebêjan da ye.

Kurdên xwezayî û kurdên nexwezayî

Alan Pîrê

Ji ber ku zimanê me li welatê me li me qedexe bû, em fêrî kurdîya nivîskî nebûn.

Ji ber ku xwendin li welatê me bi zimanê serdestan bû, em hînî kurdîya nivîskî nebûn.

Ji ber ku serdestan her tişt li me ferz kir, zimanê xwe, çanda xwe, ola xwe, şêweya dewletbûna xwe, em man bindest û hin ji me hatin bişaftin û gelek jî li ser kurdîya xwe ya xwezayî man.

Kurdîya xwezayî çi ye? Dibe ku hûn bipirsin.

Kurdîya xwezayî ew kurdîya ku mirov xwe wekî kurd bi yên din dide naskirin, tenê ji ber ku dê û bavê wî an wê kurd in, an tenê ji ber ku kurd ji dayik bûye.

Kurdên xwezayî, ew kurdên ku çêbûn û kurd ji dê û bavên xwe re çêbûn, çavên xwe li vê dinyayê vekirin û xwe dîtin kurd, xwe nedîtin ereb an faris an tirk an alman. Tiştekî din tune ye ku wan dike kurd ji wê zayîna wan a kurdî pê ve, ji wê dîroka malbatî pê ve; êla wan, pêşîyên wan û her tiştê ku wan bi xwe nekirîye lê yên berî wan kirine.

Gelek kurd kurdên xwezayî ne. Û gelek kurdên nexwezayî tên û dibêjin, ma çima yên din ji kurdîtîyê re nakin, çima yên din zarokên xwe naşînin şer, çima yên din pereyan di ber Kurdistanê de nadin, çima yên din karekî welatparêz nakin, çima yên din zarokên xwe fêrî kurdîya nivîskî nakin? Û gelek pirsên dîtir.

Ez dixwazim bibêjim ku kurdên nexwezayî di van pirsên xwe de ne mafdar in. Ji ber ku dê çi hêviyê ji kurdên xwezayî bikin. Rast e kurd in lê ji ber ku ne ereb bin, kurd in, ne faris in, kurd in, ne alman û tirk in, kurd in. Tenê ji ber ku kurd ji dayik bûne. Tiştekî wan û kurdîtîyê bi hevûdin re tune ye.

Kurdên nexwezayî êdî kî ne?

Kesên ku kurd in û xwe wekî kurd bi yên din didin naskirin. Ne tenê ji ber ku kurd ji dayik bûne, an dêya wan an bavê wan an pêşîyên wan kurd bûn. Na lê ji ber ku tiştek li kurdbûna xwe zêde kirine. Kurdbûna xwe bi zimanê kurdî, bi çanda kurdî, bi rabûn û rûniştina kurdî xemilandine. Kurdên nexwezayî ew in ên nikarin wekî kurdên xwezayî bijîn. Nikarin!

Sekna li dijî zilmê

Şerîf Yilmaz

Pêvajo heta ku hûn bêjin bes nebaş e. Tu li axaftina deshilatdar û dîktatoran mêze dikî gotinek wan ya din nagirine. Dixwazî bila sîyasî be û dixwaze bila aborî be hemû jî nerast in. Ez bawer im ew bi xwe jî ji gotinên xwe bawer nakin. Me çend sal berî niha nedigot bi vî awayî nabe lê mixabin va bû çend sal li ser navê ol û baweriyê gelek mirov dîn û har kirine. Di malekê de ku yek bibêje ez her tiştekî zanim û yên ji din re ji bêje hûn bi tu tiştî nizanin, wê demê di hundirê wê malê de dê pevçûn derkeve. Dawiya pevçûnê jî xizanî û têkçûna wê malê ye. Ji bo welat û rêvebirina wî welatî jî ev tişt wiha ye.

Dema ku mirov li pergal û dîroka dîktatoran dinêre bi vî awayî him pergala xwe û him jî pergala gelê xwe tarûmar kirine lê dîsa bi vî awayî bi rê ve dibin. Bi rastî jî tiştekî pir balkêş e. Însanan birçî dike û bêçarê dihêle. Piştre ji bo ku ji nêza nemirin çend kurişan dide wan. Yên birçî dibêjin welehî ev zilam mirovekî gelek baş e. Xwedê jê razîbe lê nizane yê ku wan birçî dihêle ew zilam bixwe ye. Di pergala dîktatoriyê de dizî heye, xizanî heye, kuştin heye, girtina mirovên bêsûc heye. Çiqas tiştên nebaş hene hemû di perhala dîktatoriyê de hene. Heke li welatekî ev tiştên ku em qal dikin hebin tê wateya ku ew welat ji hêla dîktator û serdestekî ve tê birêvebirin.

Ez ê ji we re mesela cotkar, gayê wî û lawikê cotkar bêjim. Li gundekî bav û kurikê xwe diçin nav erdê xwe ku bi ga cot bikin. Nîr dikin stûyê ga û haletên xwe jî amade dikin. Mêrik misasa xwe dixe destê xwe û dest bi cotê xwe dike. Pênc kêliyan li zeviyê xwe cot dike lê ga êdî nema bi ya cotkar dike. Mêrik çawa dike ga di cot de naçe. Mêrik çend misasan li ga dixe lê dîsa jî ga nameşe û xwe davêje erdê û xwe dirêj dike. Ga li hemberî zextên cotkar li ber xwe dide û bi ya cotkar nake. Cotkar fêh dike ku êdî ew nikare bi zorê bi ga cot bike. Mêrik êdî dest ga nade û misasa xwe di axê de diçikîne. Dizîvire diçe pêşiya gayê ku bi ya cotkar nake û çavên wî maç dike. Kurik ji bavê xwe dipirse û dibêje bavo welehî min tu tiştek ji te û gayê me fehm nekir. Cotkar dibêje ji bo çi kurê min. Kurik jî dibêje bavo ga di cot de neçû û xwe avêt erdê. Tu zivirî çûyî û te di ser de çavê gayê zexel maç kir. Bav dibêje kurê min ew li gorî me ga be jî canê wî heye û vê yeka me qebûl nekir. Li ber xwe da û ya xwe bi ser xist. Ji ber vê yekê jî yê ku mirov pê nikaribe divê mirov li ber deyne û bêje her bijî ji te re.

Niha mesele hinekî wisa ye. Heke çiqas desthilat bi çavekî koledar li me binêrin jî divê em ji ya xwe danekevin. Divê em bi rê û rêbazên encamgir dikaribin bi serdestan gav şûnde bidin avêtin. Dîsa ji şert û mercên jiyanê çiqas giran dibin jî bila bibin hewce ye mirov li hember zilma dîktatoran serî hilde û li ber xwe bide. Heke gayek dikaribe bi ya cotkarekî neke divê em mirov jî dikaribin bi ya serdestan nekin. Cotkar diçe çavê ga maçî dike lê divê serdest dest û pêyên civakê maçî bike. Ew jî bi sekna me ve girêdayî ye.

rupel 9.qxp_Layout 1 4.09.2020 19:41 Page 1

1ê Êlule Roja Haştîye ya Dinya

Her serre 1ê Êlule Roja Haştîye ya Dinya hemeyê Dinya de yena pîrozkerdene. Na roje seba Rojhilatê Mîyanênî û taybetî seba ma Kurdan rojêka wayir mehneyêkê cîyayî ya

Mahîr Uzmez

1ê Êlula 1939ine de faşîzmê Hitlerî Polonya îşgal kerd û bi ney îşgalî, Hitlerî bi sebebê herbê dinyaye yê 2ine. Di ney herbê dinyaye de bi temamî 65 mîlyon însanan weşîya xo vîndî kerdî. Nêy 65 mîlyonî însanan ra, se ra 33ê înan esker û sewdî, 67ê înan sivîlî bîy. Eno şer de çandi eskerî hamey kiştene, dide qatê eskeran, însanê feqîrî hameyî kiştiş.

Herbê Dinyaye yê 2ine bi maglupbîyîşê Hitlerê 1944î de qedîya. Herbî ra pey îttîfaqê Warşova ke hetê dewletê sosyalistan ra hamêy bî viraştin, roja ke Faşîzmê Hitlerî Polanya yê işgal kerdî bî, na roje seba pawitina haştîye, Roja Haştîye ya Dinya ameye qebûlkerdene.

Yewîtîya Miletan zî 21ê Êlula 1981ine de ze Roja Haştîye ya Dinya qebûl kerde. Bi yewna watişî reyde, aşma Êlula semedê Dinya yena Megna Aşma Haştîye.

Herbê 2ine yê Dinya sero 56 serrî vîyartî labelê Dinya reyna dekewta mîyane yew şerê neweşîye. No şer zî axa Rojhilatê Mîyanî de pêk yeno.

Bi mudaxelekerdena dewletê kapîtalîstan reyde, herema Rojhilatê Mîyanênî de heya nika bi se hanzaran însan cuwîyeyê xo vîndî kerdî. Nê hêzê hegemonikî andike kewtê mîyanê hesabanê xo êy şenikan ke magdûrîyet, talan û qirkerdişan şaran nêveynenê. Heya nika ney şerê 3ine Dinya de bi se hanzaran însan cuwîyeyê xo vînî kerdê, reyna ande zî însanî birîndar bîyî. Bi mîlyonan însan zî cay û wareyê xo terk kerd û koçber bîyî. Trajedîyê herbê 3ine yê Dinya nika ra heme şerê ke dinya de heya enka vejîyayê orte vîyarto.

Rojhilatê Mîyanî de rewşe bi ney awayîya, labelê rewşa Vakurê Kurdistan û Tirkîye zî naye ra cêr nîyo. Bi taybetî 24 Temmuza 2015î ra heya na roje, welatê ma bîyo zê zindanê akerdeyî.

Faşîzmê Dewleta Tirke ende xidar biyo, bê sinor êrişê şaran keno. Welatê ma de êdî heq û huquq waştiş, bîyo suco tewir pil.

Eno sîyesetê Dewlata Tirke xo ra yeno naskerdene. Hewce nîyo ke merdim mînak bido. Rewşa Tirkîya welatê Afrîkaye ke bi dîktatorî reyde yena îdarekerdene zî vîyarta. Roje çin ya ke însan bêro tepiştene û roje çin ya ke însan bêro kiştene. Talukeyo tewr pîl eno yo ke tepiştene, kiştene û îşkence normal yenê dîyiş.

La belê rayna zî werwa nêy şerwazan tekoşînkerdiş wazîfeyê merdimayîye yo.

Şer waştiş yeno hesabê kamî?

Bê niqaş şer yeno hesabê zaliman û dişmenê şaran. Çimkî mêrdim yan zî sîstemo zalim, semadê dewamkerdina erk û îqtîdarê xo şer, kiştene, talan û qirkerdqene xo rê keno alet. Heya enka na Dinya de heme zalim û dîktatorî bi eno metodan reyde hukumdarîya xo domnayê. Coka werva enê şerwazan, Haştî waştiş semedê pawitişê rumetê merdimayîye, ferzo! Çimkî yew karê însanî enê şerî mîyan de çinî yo. Şer feqiran hama zî feqîr keno, komel bêquwet û bêtaqat verdeno.

Ana haseno ke kam menfeatê cê kura de bibo, lazim o aye dim şêro. Sîstemê hegemonîkî, însanê zalim yan zî dîktatorî menfeatê înan şerî de esto, ê zî şerî reyde menfîetanê xo îdame kenê. Seba înan kam kişyayo, kam bêmay û bêpiy mendo, keyeyê kamî rijîyayo, kam koçber bîyo zaf muhîm nîyo, înan rê tena domnayîşê menfeatê înan lazim o.

Coka o însano ke rayîrê haştî dim şêro, him verva heme zaliman vejîyeno hem zî rumetê merdimayîye paweno.

Haştî hem semedê min, hem semedê şima pêrna rê lazim o!



Tirkîye û qirkerdişê cinîyan

Semra Turan

Tirkîye de hetê dewlet û camerdan de şerêko bêhempa serê cinîyan de dest pekerdo û roj bi roje hîna zêdetir berdevam keno. Polîtîkayêko taybet her cayê Tirkîye de serê cinîyan de yeno ramitene. Cinî her roja bîne bi destê camerdan şîddet û zilm vînenê, yene tacizkerdiş, tecawizkerdiş û kiştiş. Ganî derheqê çîyo ke serê ma cinîyan de qewimîyenê, tespiteko net bero kerdiş. No welat de çîyo ke serê cinîyan de qewimîyenê name ci qetlîyam nîyo, qirkerdişê cinîyan o. Dewlete polîtîkayanê xo de wazena no welat de cinîyan qir bikera.

Eno hewte (Goreyê dayeyanê Platformê Ma Do Cînayetê Cinîyan Bivindarnî) tena aşma tebaxe de 27 cinîyî hetê camêrdan ra ameyî qetilkerdene. Her aşma ke şono qetilkerdişê cinîyan zêdetir beno.

No hewte çîyo ke zerê ma de zaf jan kerd ra yewe zî mergê Avûkat Ebru Tîmtîka ke semedê hukmkerdişê edîlî roja 238. ê rojeyê mergî de dinyaya xo bedilnaye bî. Ebru semedê edaletê Tirkîye û hukmkerdişê edîlî kewtebî rojeyê mergî. Labelê vengê Ebruye hetê selahîyetdaranê dewleta tirkî ra nêameye goşdarîkerdene û Ebru roja 238. ê rojeyê mergî de dinyaya xo bedilnaye. Dinya û Tirkîya de nimuneyêk sey Ebruye çin o. Wexto ke cayêk de edaletsizîyêk bibo sere de cinî xo erzena vernî û serewedartişan de serkêşî kena. Ebru zî nê cinîyan ra yewe ya û semedê ma pêroyê cinîyan nimuneyêk muhîm a. Çi heyfo ke vengê Ebru nêameye eşnawitene û semedê mergê aye ferman ame dayene. Dewlete cinîya ke edalet wazena bi destanê xo qetil kena.

Mi sere de zî nuşte. Tirkîya wazena vernîyê cinîya ke têkoşîn bikera bigîra û bi polîtîkayanê xo cinîyan bikişa. Nê cinîyanê xoverdayoxan ra yewe zî Dayîka Aştîye Makbule Ozbeke ya. Dayîka Makbule Ozbeka 70 serre semedê aştîya Tirkîya bi serran o têkoşîn dana. Labelê çîyo ke vera têkoşînê Ozbeke de ci rê ame kerdiş, tepiştiş û zindna bî. Dayîka Makbule bi serran çendneqle ameye destbendkerdiş û tepiştiş. Tewr peynî Zîndanê Amedî de krîzê zerrî derbaz kerde. La reyna zî dewlete dayîka Makbule serbest vera nêdana û wazena dayîka Makbulezîndan de bimira. Sucê dayîka Makbule tena oyo ke semedê no welatî aştî waşta. Labelê dewlete wazena cinîyê ke doza aştî û edalet kenî û hemverê camêrdan vejîyenê yew bi yewe qetil bikera.

Welatê Tirkîya semedê ma cinîyan welatêko asayî nîya. Dewlete bi nê polîtkayanê xo wazena cinîyan rê vaja vengê xo mekerêne û ganî şima bindestê camêrdan bibe. Labelê cinî çiqas bêrî qetilkerdiş û bierzîyî zîndanan zî fek têkoşînê xo ra vera nêdanî û semedo ke cinîyan rê mîrasêk vera bidî têkoşîn danî. Ma semedê na nimune nêşorî zaf dûrî. Qet bêşik no hewte dayîka Makbule û Ebru Tîmtîke semedê pêroyê cinîyanê dinya bîyî nimuneyê.

Ma cinî nêwazenê dayîka Makbule sey Ebru Tîmtîke vindî bikerê. Dayîka Makbule semedê ma pêro kesan bi serrana ke têkoşînê aştîye dana. Ganî ewro pêroyê cinîyan, şar û heme kesê ke aştî, azadî û demokrasîya Tirkîya wazenê, vengê dayîka Makbule bieşnawî û ci zindan ra bivejnî.



Dewey Ma



Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

Licey de çirê dewicî jobînan kişenê?

Babî yan zî pîlê keyî desthilatdar o. O çi vaco zey ê beno. Hetê ma kurdan de anekî bî. Temam, dewlete zî zey babî ya, la bi seyan serre, belkî bi hezaran serre ma hetê dewlete bi away fermî bîbî, la mîyanê cuye de çinê bî. Babî, yan zî pîl kam bî ê ca girowtêne. Vatişê ê derbas bîne. Edalet bi ê hameyne viraştiş, yan zî bêedaletî bi ê dewam kerdêne.

Wexto di hebî tûtan dayne pêro pîlêke (desthilatdar) goşê înan girowtê, ê têra kerdêne. Yan zî serê înan de hêrs bîne û ê ca de têra bîne, yan zî hameyne werê.

Serrî derbas bî, se serreyî derbas bî, dinya bedelîyayne, kurdî zî bedelîyayne. Hendî wendey kurdan virazîyay ne, zanay kurdan û dima ra zî rêxistinê kurdan zî virazîyayne. Hendî şarî goş dayne înan. Şiklê desthilatdarî bedelîyay bî...

Wexto dem hame serranê 90'inan kurdan mesela xo mîyanê xo de hel kerdêne, nêşîne verê beyray mehkeman, goş nêşayne hakim û sawcîyan.

Verî enî serran semedê çende çîyan dewicî nêşîne mehkeman: Jo tera di mehkeman de kam perey cê bîne eşkayne karê xo hel bikero, yê feqîran zî pere çinêbî, her înan zirar vînayne. Meselaya ziwanî zî bîbî: Ga dewicê ke çawey verê hakim û sawcî de bi tirkî derdê xo biyaro ziwan? Tirkî nêzanayne, ka go sebikero?

Dimay serranê 90'an ra xeynî enî çî ma vatî, fikrê kurdan ê kurdîtî zî raver şîbî û qeybî a joy zî hendî kurdî nêşîne verê hakim û sawcîyan. Pîlê dewe, rîsipey kamî bî, vatişê kamî derbas bîne bî înan meselay hel kerdêne. Semedo paştey înan de rêxistin zî bîbî, mesela zehf rehet hel bîne.

Pers eno yo: Çirê ewro dewicê Licey guleyan vera danê jobînî û jobînî kişenê? Di aşmêke de hem Licey de, hem Erzirom de kurdan bi guleyan jobinî kiştî? Di wirdî meselan de nizdê des tenî merdî.


Gelo ma eşkerê vacê semedo ke desthilatdarî enî cayan de bî sistî loma enî çî benê? Mesela gorey des serrî verî ra rewşa partî kurdan HDP/DBP, rewşa şaredarî kurdan qezay û bajaran de çi ya? Gelo ê nêşkenê dest berzê ê cayan? Gelo ê cayan de desthilatdarî bîya siste loma dewicî jobînan kişenê?

Mesela hetê çiyay ra şina? Go ewro ra pey seyîn bo? Dewan de, qezan de, bajaran de go kam edalet virazo? Reyna go dewicî jobînan bikişê? Merdim eşkeno se bikero?

Persî zehfê. La ciwab mi dir çinîyo. Ez tenî fikirêna: Go halê me seyîn bo? Licey ke mîyanê qezayanê kurdan de bi name û veng a, Liceya ke însanî bi serey ay sond wanenê go seyîne biba? Siba, di sibay go dewicî reyna gule veradê jobînî û jobînî bikişê?

Erê, bi kilmî mesela ene wa: Kamco dew, qeza, bajar de desthilatdarî di destê kamî de bo, ewca gorey a joy ra şikil gêno. Desthilatdarî (kam beno wa bibo) beşko edalet virazo însanî go goş bişanê înan û jobînî nêkişê, la desthilatdarî çinê bo, edalet zî çinêbo go hema zehf merdimî jobînan bikişê.

rupel 10++.qxp_Layout 1 4.09.2020 19:42 Page 1



Zarokê jîr



Zarokek her roj diçû bankayê û 100 lîre di hesabê xwe de radizand. Memûrekî bankayê haya mudûrê bankayê ji wî zarokî çêkir. Mudûr got heke sibe hat wî bînin ba min. Roja din dîsa zarok hat perê xwe razand, xebatkarê bankayê ew bir ba mudûrê xwe.

Mudûr jê pirsî: Tu her roj van pereyan ji ku tînî. Zarok got ez bi xelkê re dikevim şert de û ez zora wan dibim û van pereyan bi dest dixim.

Mudûr jê re got ka were bi min re jî bikeve şert de. Zarok got temam, ez dikarim çavên xwe maç bikim. Mudûr got tu nikarî. Zarok got şertê 100 kaxetî. Mudûr got temam. Zarok lensa çavên xwe derxisrt maçî kir û dîsa xiste çavên xwe. Mudûr neçar ma 100 kaxiz dayê lê gelekî li zora wî çû. Roja din mudûr li hêviya wî ma ku heyfa xwe jê bistîne. Zarok hat dîsa mudûr pê re ket şertê.

Zarok got vê carê şertê 200 kaxizî û vaye min deh karkerên bankayê jî anîne vir ji bo şahidê min û te bin. Mudûr got min qebûl e. Zarok got, derpiyê te sor e. Mudûr keniya û got na wele te pê dernexist. Zarok got na sor e, ka nîşanî me bide heke ne sor be ez ê 200 kaxetî bidim te.

Mudûr şalê xwe anî xwarê, zarok 200 kaxet dayê. Mudûr got te dît çawa min zora te bir li şûna 100 kaxizê xwe min 200 ji te stand. Zarok got erê min 200 da te lê min 800 kar kir, ji ber ku min ji van 10 karmendên te re gotibû ez ê bihêlim patrohnê we şalê xwe ji xwe bike. Em ketibûn şertê 100 kaxetî îca ka bihesibîne. Min her yek ji karkerên te 100 ji wan bir û 200 da te. Îca Kî li karê ye mudûr beg?

Anonîm

XAÇEPIRS

JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Îş, xebat 3. Dem, saet 5. Dengbêjeke kurdên Rojava (Rifetê…)
6. Sewaleke ku navê gemiya çolistanê lê dikin 7. Kok
9. Zelal, vekirî, ne veşartî 12. Henek, qerf 14. Cihê ku genim lê tê hêran
15. Ezman 17. Cînavkek pirjimar
18. Notayeke muzîkê
22. Zilm û zor

JI JOR BER BI JÊR

1. Kar û xebat 2. Têbînî, not, şîrove 3. Cînavka pirsyariyê 4. Bi derziyê vedibe û cil pê tên dirûtin, her wiha navê nexweşiyekê
5. Gundekî dîrokî yê Mêrdînê
7. Qad 8. Kesê ku çavê wî nabîne
10. Xelet, çewt 11. Govend, sema
13. Sala ku em tê de ne
14. Ji bo spasiya kesên tiştekî baş dikin tê bikaranîn
16. Dahênan, afirandin.
19. Koka kurdan û hin gelên din.
20. Rengek
21. Noteyeke muzîkê
23. Xak, erd

Bersiva hefteya borî



Kewê Redkan



Ber dikanê...

Em hemû qîzên xama ne; kelekela me ye, pirtepirta dilê me ye; her yek ji me di dilê wê de şêrek veşartî heye. Îca ne bi xêr, di nav malên me de ne kanî hene, ne jî çemek dikişe. Kanîya herî nêzîk saetek e. Ew jî her carê dema ku em diçin ser kaniyê, em di ber dikanan re derbas dibin.

Wexta ku em di ber wan dikanan re derbas dibin, hemû xortên li wan der û doran derdikevin ber dikanê. Qûna xwe bi vir de û wê de dibin; porê şehkirî, tuncika şil davêjin ser enîya xwe û li me dinêrin. Heta ku em bi gavên bilez di ber wan re derbas dibin, xuhdana reş jî li ser rûyê me morî norî dibe.

Dema em digihîjin ser kaniyê, êdî her yek ji me ji xortek ji wana li ser zimanê xwe digerîne. Qerf û henekan li bejn û bala wan, ew tuncika wan a şehkirî dema ba lê dixe hemû tevlihev dibe, em wana di navbera xwe de dikin nav rêxa çêlekan û derdixin.

Em dizanin ewna jî di navbera xwe de qala me (rind an jî xirab) dikin lê li ser kaniyê kêfa ku em dikin tu kes nake.

Dîsa rojekê ji wan rojan, germa dawiya havînê ye. Dîsa kirmekirma dilê me ye; dayikên me ji me re dêrên bedew didirûn, em jî kar hebe jî tunebe jî ji xwe re karên bêmane derdixin.

Ew roj dîsa em qîz li hev civiyan û çûne ser kaniyê. Dema em di ber dikanan re derbas bûn qet kesek ji wan derneket derve û bala xwe nedane me. Em jî wisa metelmayî çûn ser kaniyê, me ava xwe tijî kir, em derketin ser rê, (di vê navberê de kaniya avê ji dikana wê de ye û di nav newalekê de ye). Dema em di ber dikanê re derbas bûn, yekî ji nav wan xortan dengê xwe bilind kir û got; keçêêê, tu wê avê ji kê re dibî? Tu ava hemû van kaniyan jî bibî dîsa qirêja li ser pastîya birayê te paqij nabe!!!!

Di pey vê gotinê re te digot qey aveke sar bi ser serê min de rijandin, em hemû jî wisa li cihê xwe matmayî man, gelo ev bêbexta van gotinan ji kê ji me re dibêje? Hema hemû jî bi bira ne. Ez di cihê xwe de sekinîm. Gavên min pêş de naçin, ew min paş de dibin, ber bi dikanê ve dibin. Almastê nedixwest bi kesekî re devejeniyê bike. Wê got, neçe hemû kes wê bi çavekî nebaş li me binêrin. Ez qet guh nadim gotinên Almasta bêdeng. Di bin wê tava ku me diqijirîne de wek pamedorên nava bostanan soro moro bûme. Ez ê çawa van gotinan daqurtînim û careke din jî qet nikarim di ber wan dikanan re derbas bibim.

Hema min qeyntera li ser milê xwe li wan vêderokên tijî av azad kir, da destê xwe û berê xwe da dikanê. Dema min xwe gihand ber dikanê, hemû jî revîyan ketin hundirê dikanê. Her yekî xwe avête ber taldekî eşyayê nav dikanê. Min got, ew kîjan kurê kerê me yê gewr bû wisa destê xwe li sînga xwe xist û peyv gotin? Bû kirmehirma wan, naaa, me tiştek negot, gedek li vê derê bû wî yê dev rêx wisa gotinên xerab ji we re gotin. Agir bi serê min ketiye, min qeyntera destê xwe bilind kir û di nav pencera dikanê de danî. Yek ji qulika xwe derket di serê wî de jî yek danî, yê din, yê din, hemû jî di nav toz û dûmanê de man. Min got, careke din, dema yek di van deran re derbas bû weke merivan di cihê xwe de bisekinin. Gotin, me rêxeke mezin xwar, hûn xwişkê me ne, filan û bêvan. Min got, em ne xwişkên we ne, em cînarê we ne gayê nav golikan... Wexta ku em vegeriyan malê, me ji tirsana qet li dû xwe nenihêrt û bi lez çûn malên xwe. Niha jî dema em di ber dikanê re derbas dibin ew xortana direvin dikevine dikanê, çi kêfa min tê, min dilê xwe rehet kir.

rupel 11++.qxp_Layout 1 4.09.2020 19:43 Page 1

Belkiyê du pirtûkên nû çap kirin

Navenda Nûçeyan

Du pirtûkên helbestan ên nû li pirtûkxaneya kurdî zede bûn. Weşanxaneya Belkiyê pirtûka Rizoyê Xerzî ya *Bêyî Pêjna Te* û pirtûka Rênas Jiyan *Berfwerîn* çap kirin.

Pirtûka helbestan *Bêyî Pêjna Te* berhema Rizoyê Xerzî ya sêyemîn e. Pirtûk 96 rûpel e û di pirtûkê de derdora heftê helbest hene lê mirov dikare bêje ku helbesteke ji heftê beşan pêk tê, ji ber ku tev bi sernavê *Bêyî Te* hatine nivîsîn. Şêwekar Luqman Ehmed jî bi xêzên pirtûk xemilandiye.

Pirtûka Xerzî ya ewil bi navê *Dema Çavên Te* di sala 2001'î de li paytexta Sûriye Şamê derdikeve û berhema wî ya duyemîn jî bi navê *Dilê Min Ne Dîn e* di sala 2011'an de ji weşanxaneya Aramê ya li Amedê der diçe.

Xerzî dide zanîn ku helbestên wî yên pirtûka *Bêyî Pêjna Te* li ser 'jiyana bêazadî' ne. Her wiha Xerzî spasiya wan kesan dike ku ji bo pirtûka wî ked dane û wiha dibêje: "Spas ji bo Luqman Ehmed ê wêneyên hundirê pirtûkê xêz kirin, Xefûr Husên ê wêneyê bergê çêkir, Felat Nîştiman ê redakîsyona pirtûkê kir, nivîskar-helbestvan Rênas Jiyan û weşanxaneya Belkiyê yên pirtûk çap kir û her wiha spas ji bo xwendin û nirxandina beriya weşanê ya mamoste Îbrahîm Seydo Aydogan..."

Helbestek ji pirtûka *Bêyî Pêjna Te*:

'Bêyî te
Dilê bavekî ji qidûmketî me
Di bin darbesta keça xwe de
Bê per û bask im
Hestê birayekî dilperitî me
Girî di gewriya min de ziwa dibe
Tilîliya dayikeke kezebşewitî me
Di merasîmên cangoriyan de
Qêrîna xwişkê me
Di rûyê zordestan de
Ku guhê esmên diçirîne…'





Berfwerîn

Pirtûka helbestan a *Berfwerîn* jî pirtûka nivîsakar û helbestvan Rênas Jiyan e. *Berfwerîn* pirtûka Jiyan a helbestan a pêncemîn û ji 8 beş û 20 helbestan pêk tê û 104 rûpel e.

Yek ji helbestên pirtûka Berfwerînê:

'bi devkî hirç
û bi eşîrtiya dilbipirç
yekîtî ne pêkan e, bavê derewan e
werin em bibin ''kurd''
wê çaxê wê kes nikaribe li ber me bêje "kirt"
di vê seqema bindestiyê de
em pif kefa destê hev bikin,
keldûmana devê xwe tevlihev bikin
werin em bibin behr
wê çaxê wê bixeniqin di nav ava me de
hemû dijmin û ziqûm û jeher…'

Rênas Jiyan tevî pirtûka helbestan Berwerînê 13 pirtûkên din jî li pirtûkxaneya kurdî zede kirine. Heta niha pirtûkên Jiyan nivîsîne ev in: Mexzena Xwînê (helbest), Janya (helbest), Dîn û Şîn (helbest), Diêşiya (helbest), Çirûskîzm (teorî-felsefe), Stranên Sor Niviştên Mor (roman), Spîtama (roman), Bacanên Pelçiqî (roman), Ji Şevê Re (ceribîn), Bîna Petêxan Ji Hêsirên Min Tê (kurteçîrok), Ponijîn (ceribîn), Di Tuwaletê De (şano), Wêjeya Kurmancî Pênûsên Çardederb (analiz).

Helbesthez û xwînerên kurdî dikarin pirtûkan li pirtûkxaneyên kurdî peyda bikin.

Guherîna bi demê re!

Rohat Kurêşî

Di dîrokê de, dem û dewran, sal û zeman bûye mijar ji dengbêj, çîrokbêj, rewşenbîr, ronakbîr û wêjevanan re. Civata geriyayî yan li ber agirê tifikê yan jî li ber çira û lembaya don û gazê guhdariya gotina ji devê kesê ku dipeyive kiriye. Hebe pirs û nebe jî fêm hebûye bi erêkirinê re ku ser diheje. Rêzgirtin û hurmet ji hev re hebûye. Mezin mezinbûna xwe, zarok jî zarokbûna xwe zanîbûye. Hevdu guhdarîkirin û hempêzkirin hebûye. Çi pirs û girêk hebin jî ji nav hev hatine derxistin û zelalkirin. Ol û dîrok, wêje, felsefe, erdnîgarî, destan û mîtolojî hatine vegotin û nîqaşkirin. Zanîn hatine parvekirin û kêmasî hatine derbaskirin. Di şevên tarî de li ber şewqa zilûlî jiyana mirovî û civakî bi wate bûye.

Niha dem û dewran, sal û zeman guheriye. Êdî li şûna şewqa zilûlî ceyran şevên tarî ronî dike. Dengbêjî ket qaset û CD'an, deng û qirik guherî, şekl û şemal guherî. Kesî nema li çîrokbêjan guhdarî kir. Rewşenbîr û ronakbîr tirsonek bûn, wêjevan ji civak û civatê qut bûn. Pirs bê bersiv man, girêk kor bûn. Ol û bawerî, dîrok, wêje, felsefe, erdnîgarî, destan û mîtolojî nehatin nîqaşkirin. Civakbûn û nirxên civakê li paş man. Mezin mezinbûna xwe, zarok jî zarokbûna xwe êdî nema dizanin. Guhdarîkirin û hembêzkirin êdî nema; rêzgirtin û hurmet nema. Zanebûn nayê parvekirin û kêmasî nayê derbaskirin. Êdî di nav rojê de jî jiyana mirov û civakê tarî û bê wate dibe.

Bêguman divê ji amûrên ku jiyanê rihet û hêsan dikin mirov sûdê werbigire lê belê ji esl û feslê xwe dernekeve. Dibe ku teknîk û teknolojî bi pêş ketibe lê divê mirov ji çand û pêşeroja xwe haydar be. Bêçandiya mirovekî/ê bêesliya wî/ê ye. Bêeslîbûn bênetewebûn e. Kesên esl û feslê xwe nizanibin, nikarin bijîn. Em bala xwe bidinê ji şevbuhêrkan em hatine ku derê. Yan em li kafe û kafeteryayan dema xwe pûç dikin an jî di destên me de telefonek ji derveyî eleqeyê li tevahiya cîhanê digerin. Çi xêr û xêrata vê ji mirov û civakbûnê re heye? Ez bawer im ji xêr û xêratekê wêdetir em li dû bêxêrî û xerabiyekê ne! Em bêxêrî û xerabiyê bi çand, civak û hebûna xwe re dikin.

A pêwîst ew e ku mirov li xwe û sedemên hebûna xwe bifikire. Fikirîneke rasteqînî dê kes ber bi dahûrandineke çareseriyê ve bibe.

Dibe ku dem û dewran, sal û zeman biguhere lê divê nirxên mirov û civakê bên parastin. Tişta ku civakbûn ava dike ew nirxên hevpar ên mirovahiyê ne. Heke mirov bê nirx bimîne, wê demê çand û civakbûn li holê namîne. Nebûna civakbûnê jî nebûna mirovî ye.

"Feyza me weke Nîl e lê em Dîcle û Ferat in"

Seyidxan Anter

Pesinên Mezopotamyayê pirin. Li gorî saloxan, Mezopotamya dergûş (landîk) a şaristanîyê ye. Berya her warî, li bakur û başûrê Mezopotamyayê li gund û bajar li peravên rûbaren Tîgrîs û Feratê ji alîye hûrî- mîtanî, sumerî, akadî elemî û yên din ve gund û bajar ava bûne, çandinî û xwedîkirina pez li vir dest pê kiriye; teknîk, matematîk û zanist li vir bi pêş ketiye.

Du sembolên mirovatiyê yên giranbuha alfabe (pîktogram û ideogram ên dema sumeran) û çerxe (teker, dolab) li Mezopotamyayê nuve bûne.

Beşek mezin ji Mezopotamyayê Kurdistan e. Ji ber dewlemendî, spehîbûna xwe û her du kezîyên xwe yên hunandî, rûbarên Tîgrîs û Ferat, pesnê Kurdistanê wek "Cenneta Bakî" ango aden an jî buhuşt, dane.

Di nav her du çeman de û li peravên wan, ji roja roj ve, mirovahîyê cî dîtîye. Ji etîmolojiya navan bigire heta bi tabletên sumeran; ji tofana Nûh heta bi nivîsên di pirtûkên pîroz de; ji mîtolojîyê heta bi wêje û folklora îro; ji serçavî heta dawîya Tîgrîs û Feratî, li her du rûbaran çi cure masî û ajal peyde dibin; ji bazirganiya bi kelekan heta bi zebeşên Amedê û bendavên hatine avekirin... çi hatîye serê Kurdistanê, ji bo me gelekan ne diyar in.

Kambaxîya dolemendîyên serax û binax, zanyarî, hişmendîya dîrokî, wêje, ekolojîya Kurdistanê ji alîyê dagirkeran ve ne karekî nû ye. Dagirker û pergala wan kapitalîzm a îro, ev wêranî roj bi roj pît û zêdetir dibe. Dê buhuştê li me bikin dojeh!

Vê dema dawî hin rewşenbîr li hember wê kambaxê radiwestin û bi kêmanî me û nemaze nifşên nûgihayî di wê xalê de hişyar dikin; kedek pêwîst, karekî zext û barekî giran. Yek ji van mamostê me Amed Tîgrîs e. Wî vê carê her du rûbarên, her du "şahdamarên" Kurdistan û Mezopotamyayê ji xwe re kiriye mijar. Bi çavkanî û belgeyên dewlemend, weşanxana APEC'ê, berhema Amed Tîgrîs "Dîcle û Ferat" çap kiriye.

Kurdistan û rûbarên Kurdistanê bûne hoya gengeşîyên nav dewletan, an jî mîna ku Amed Tîgrîs dibêje: "Dîcle û Ferat jî du çemên tixûbdêr in. Her du jî ji Tirkiyeyê derbasî Suriyeyê û ji wir jî derbasî nav tixûbê Iraqê dibin. Bi çêkirina bendavên li ser Dîcle û Feratî re her ku diçe sal bi sal di nav van her sê dewletan de gengeşî û nexweşîyên li ser avê bêtir û tûjtir dibin. Her sê jî weke wawikan ku li ser lêş bi hev kevin, li ser ax,av û petrola me li hev nakin."

Amed Tîgrîs xebatek ansîklopedîk kirîye. Ev berhem hêja ye di her malê de be, nemaze di malên ku gedê wan diçin dibistanan de, hebe. Her wiha ji bo dibistanan - dibistanên bi perwerda kurdî û zarokên kurd zimanê dê li derveyî welat dixwînînre, xezîneyek zanyarî û naskirinê ye. Li vir erkek tê ser riya me ku; pedagog, zimanzan û nivîskar û weşangerên bi wêjeya kurdî re mijûl in, dest bidin hev da ku ji bo "Dîcle û Ferat" kitebeke kar (arbetsbok) saz bikin.

Li vir û li wir hin şaşîyên ziman peyde dibin. Lewra diyar e ku mamostê me Amed Tîgrîs ev berhem bi kêf û heskirinek berz nivîsîye ku mirov bi xwe re bi rûbarên Tîgrîs û Feratî re cûş dike.

Li nav û peravên Tîgrîs û Ferat çi heye, çi hebûye, çi bûye û çi dibe? Bersiva pirsên çi, çawa, kengî û çima dide. Îca ger hinek rabin, bi tecrûbe, zanyarî û çavkanîyên xwe vî karê berfirehtir bikin dê kurd li ser Tîgrîs û Feratê bibin xwedî ansîklopedîyek dolemend û ji nû ve dolemendîyên xwe ji talanan rizgar bikin.

Hêja ye tu vê berhemê peyda bikî û bixwînî.

Nebêje te negot ha..!



rupel 12++.qxp_Layout 1 4.09.2020 19:43 Page 1

xwebûn

7-13 İlon 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 38

İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi: Kadri Esen
Sorumlu Yazışleri Müdürü: İdris Gürmez
Yayın Danışma Kurulu: Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Yayın Türü: Haftalık Yaygın Süreli
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 ***Yenişehir / Diyarbakır***
Baskı: Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

Embara bokên kurdan; Kela Rebetê



Keştiya Alalû

Agît Yazar



Dîroka kurdan, nola mozaîqeke niwaze ye lê mixabîn ev mozaîqa rengîn û ew çend jî dewlemend, ji hêla destên bêyom ve ji hev hatiye belawelakirin. Werin em kabikên kevirê mozaîqê yek bi yek li cihê wê dînin û sûretê mozaîqa xwe durist bikin.

Di dîroka miletê kurd a qedîm de, Şahînşahîya Mîtanî xwedîyê şopeke kûr û ew çend jî eyan e. Navenda vê şahînşahîya pêşîyên me Mîtanîyan, sêkuçukîya Amed, Mêrdîn û Rihayê ye. Piştî dîroka Şahînşahîya Mîtanîyan a 3 hezar heftsed sal berîya niha, di heman sêkuçukîya van her sê bajarên me yê qedîm de, eşîreke bi navê Metînî heye. Ev eşîr bi navê xwe û bi rewşa xwe ya li ser heman axê, e'detî nola Şahînşahîya Mîtaniyeke piçûçik temsîl dike.

Bê çawa eşîra Goyîyan, wekî paşhatîya pêşîyên me yên Gotî/Gûtî ye, bê çawa eşîra Xalta wekî paşhatîya pêşîyên me yên Xaltî-Ûrartû ye, eşîra Metîna jî paşhatîya pêşîyên me yên Mîtanî ye. Û navenda vê eşîrê jî gundê Dêra Metînayê ye. Em jî wekî ekîba Dîroka Veşartî, ji Dêra Metînayê dikevin rê û berê xwe didin Kela Rebetê, embara pêlewan û bokên Kurdan.

Em ji girê Dêra Metînayê difitilin, di nav gundê Kevirşînê re derbas dibin. Par van çaxan li vî gundî, mozaîqên hezar û 500 sal berê, yên aydê Bîzansiyan hatibû dîtin. Qismeke wan mozaîqan, ên ji ber nişteciheê gundê Kevirşînê filitîbûn, niha li muzexaneya Mêrdînê tê pêşandan.

Ger ez hevokek din der barê vî gundî de bibêjim, ew ê kirinên wan yek bi yek werin bîra min û ez ê xwe ranegirim. Hingê êdî ne ev rûpel bi tenê, tevahiya rûpelên rojnameya Xwebûnê jî têrê nake. Lewra ji jinên vî gundî bigire heta kal û pîran, tevdekên wan qirdikên xwedê ne. Ango her yek ji wan dikare qûşê li stand-upên profesyonel biqetîne.

Hasilîkelam em di ser gundê Tirbamamo, Buxur, Kumtere û Sêvnatê re derbasî gundê Rebetê, ango Kela Rebetê dibin.

Heta niha em di ser navçeya Çinar, Şemrex û Dêrika Çiyayê Mazî re derbas bûne û ev gundên navên wan hatine bilêvkirin, tevdekên wan yên eşîra Metînayê ne.



Gundê Buxurê, 27 km li bakûr-rojavayê Dêrikê dikeve. Li vî gundî, aveke ku jê re dibêjin "dengiza buxurê" heye. Ji şikefteke dêwasa dizê û kûrahiya wê bêbinî ye. Dîsa di navbera gundê Buxurê û Kumterê re, lûleyên petrola Kerkûk-Yûmûrtalixa Ceyhanê derbas dibin.

Derketina ser Kela Rebetê

Ro li ber ava ye û erebe dernakeve heta ser Kela Rebetê. Camêrek trextora xwe ji nav kar derdixîne û dide me lê mixabin ew jî heta derekê dikare bimeşe. Em malavatiya wî dikin û em li lingên xwe siwar dibin. Em dibêjin de lingon bi qurban û em bi berpalê ve radipelikin. Bila gotin di navbera me de nemîne, heçî ez im, ez î sed û çar kîlo giran im. Loma jî lingên min ên reben, bi halanekê duda nayê xapandin.

Heta em derdikevin li ser Kela Rebetê, zimanê min nola zimanê tazîyê seydê, ji devê min radikişe. Di ser qereza tîbûna me re, bendava Sêvnatê, li jêra me zelal zelal pêl vedide.

Çawa em derdikevin ser bilindahiya kelê, em li colek keriyê bizinreşan rast tê. Keriyê pêz, nola heba tizbiya jihev-belavbûyî, her yek li derekê ji xwe re bi nazikî diçêre. Çaxa şivanê pêz çav li me dikeve, ew jî xwe ji jor de berdide, tê ba me. Di destê şivên de pirtûkek heye. Piştî rojbixêrekê, ez kêfxweşiya xwe ji şivên re tînim. Pirtûka di destê wî de a feylozofê gewre Arthur Schopenhauer a bi navê Metafizîka Eşqê ye. Şivanekî ku pirtûka feylozofekî dixwîne, min metelmayî dihêle û ew çend jî min ji xwe re heyran dihêle.

Êdî roj, nola sêniyeke zêrînî li pişt çiyayê Qerejdaxê difitile. Pezê şivên ber bi gund ve dilezîne. Lewra wextê dotina wan derbas dibe. Şivanê min û we jî berê xwe dide gundê Rebetê û ji me re mala xwe destnîşan dike, dibêje "aaaa wa mala hanê mala min e û li ser devê riya we ye. Niha ez diçim, ez ê li benda we bim."

Heta em xwe ji Kela Rebetê berdidin nav gund, dinya tarî dibe; êdî gur û rovî ji hev nayê kifşkirin. Şivanê me yê kurmikê xwendinê, bi sûrahîyeke dewê cemidî derdikeve pêşiya me. Bi sivikî bîna kizirî ji dew tê. Bîna dewê yadê tê bîra min; tahma dêw, bi dilê min e û ji hejmar de ketibû ka min çend qedeh dew vexwariye. E'detî em di ser dewê xwe yê nola qşayê çemidî de qarixî bûn. Dengek heşeweşekê ji hundurê hewşê tê. Tu nabêjî kûçikê malê bêhna me xerîban hilanîye û camêro xwe li me radikişîne. Em wer fam dikin kûçik pir no ye. Xwe çawa bigihîne me, ew ê me ji hev zivalzîvalî bike. Hemû endamên malê bi hêrs, bi kûçik re dixeyidin. Tevdek bi hev re dibêjin: "Dûman! Dûman! Dûman!..." Dûmanê min û we, ango kûçikê qilçixşîn ê di rengê dû de, bi zorkê aş dibe. (di vê navberê de ez qala reva me ya hundurê erebê nekim, da ku hûn xwînerên hêja bi me nizanibin ka em çiqasî tirsonek in)

Mîr Sêvdîn ê Kela Rebetê

Ji roja min romana Osman Ozçelîk a bi navê "Sêvdîn Mîrê Kela Rebetê" xwendibû û vir ve, min digot ka xwedo ha xwedo ez ê çi çax biçim serdana vê kelê. Birêz Osman Ozçelîk, hîmê romanê li ser pêwendiya di navbera Selhedînê Eyûbî û mîrên kurdan de ava kiriye.

Li welatê jêr, li derdora Heleb, Şam û Qahîreya Misrê, serfermandar Şêrko û biraziyê xwe Selhedînê Eyûbî di nav têkoşîneke bê eman de bûne. Li ba van pêlewanan, kûpê êqil Mele Îsa Begê Hekarî jî hebûye, fermandarî û serşêwirmendî ji wan re kiriye. Wer tê famkirin, Mele Îsa Begê Hekarî, di serkeftina Şêrko û biraziyê wî Selhedînê Eyûbî de, xwedî risteke gelekî mezin bûye. Heta dikare were gotin, heke Mele Îsa Begê Hekarî nebûya, dibe ku Selhedînê Eyûbî jî nebûya.

Û Hemê Şêro jî hebûye. Ev mîrê Kela Rebetê, bavê mîr Sêvdîn, destbirakê M. Îsa Begê Hekarî bûye. Di wexta xwe de wî jî mil daye milê M. Îsa Begê Hekarî û fermandariya Şêrko yê apê Selhedînê Eyûbî kiriye.

Piştî wextekê, Şêrko yê apê Selhedînê Eyûbî û mîr Hemê Şêro diçin li ber dilovaniya xwedê. Êdî Selhedînê Eyûbî dikeve dewsa apê xwe Şêrko û Mîrê Kela Rebetê, mîr Sêvdîn jî dikeve dewsa bavê xwe Hemê Şêro. M. Îsa Begê Hekarî hîn jî nola kelekê zexm li ser niga ye û vê carê dibe şîretkar û şêwirmendê Selhedînê Eyûbî. Her wiha guhê wî li ser lawê destbirakê wî, mîr Sêvdîn e jî. Di şerên giran de, mîr Sêvdîn jî destbirakê bavê xwe, ango M. Îsa Begê Hekarî rûsar dernaxîne û ew jî tev li bok û pêlewanên li derdora Dêrika Çiyayê Mazî, Şemrex û Qerejdaxa di bin hukmê mîregiya wî de ye, diçe hewara Sultanê, Qudus, Şam û Qahîrê, Sultan Selhedînê Eyûbî. Û di şerê xwe de her li pêş bûye. Ev wêrekî û cengaweriya mîr û şervanên kurdan, taca li serê Sultan Selhedînê Eyûbî, derxistiye heta li ber qatê ezmanan. Jixwe artêşa Sultan Selhedînê Kurdî a pêşeng, ji kurdên leheng yên çiyayî pêkdihat. De vêca hesab li ba we xwînerên hêja ye! Dehayê şer Selhedînê Kurdî, kûpê êqil M. Îsa Begê Hekarî û bok û beranên cengawer; şervanên kurd ên çiyayî, gihaştine hev û hêzeke xwedayî ya zornebirî ango têkneçûyî derdikeve holê.

Û ez Egîd, dewrêşê dîrok û nirxên miletê xwe yê qedîm, bi van hestan, di êvareke teng de, li nav Kela Rebetê, li embara bokên kurdan digerim. Ne tenê ez, hevalên min ên qamerevan jî li gel min in. Û ew jî bi min re, bi rêzdarî şopên mîr Hemê Şêro, kurê wî mîr Sêvdîn, M. Îsa Begê Hekarî, Şêrko û Sultan Selhedînê Kurdî dişopînin.

Kela Rebetê

Ji ber ku heta niha kolandineke arkeolojîk lê nehatiye kirin, dîroka avakirina vê kelê baş nayê zanîn. Ez di wê baweriyê de me, heke kolandineke bi rêk û pêk were kirin, ew ê şopên Mîtanîyan jî li vê kelê werin dîtin.

Kela Rebetê, li jora gundê Rebetê li cihekî bilind hatiye avakirin. Li rojhilat û rojavayê kelê du newalên kûr hene. Li hêla bakur û başûr jî, xendekên fire û kûr, ji tahtê hatine kolandin tên dîtin. Çar heb lûleyên raçavandinê li her çar qoziyên kelê hatine çêkirin. Bi dehan sarinc û her wiha embarên avê û yên zexîreyê di nav kelê de hatine çêkirin. Li hinek deveran, gorên bîrdariyê, yên di tahtî de hatine kolandin, li ber çavan dikevin. Ji van tirbên bîrdariyê diyar dibe ku dîroka vê kelê xwe dispêre dîrokeke gelekî kevn.

Li hêla rojavayê kelê, rulyefê şêrekî şipya heye. Berê wî li hêla berriya xezalan e. Li pêşiya şêr, berqefeke bi destan hatiye terrişandin tê dîtin û dîyar e ew berqef, yan ji bo rulyefekê yan jî ji bo kîtabeyekê hatiye amadekirin lê tiştek li ser naxuyê. Dibe ku di nav demajoyê de, tişta li ser hatiye niqirandin, herifî be û jê çûbe. Dîsa avahiyeke bi kemer heye, jê re tê gotin, avahiya heft derî.

Li hêla bakûr-rojavayê kelê, şikeftek bi navê şikefta qîza qrêl heye. Ji bilî vê şikeftê du şikeftên din ên bi navê şikefta Mihemedê Gewrê û şikefta Hecî Çeçan hene. Her şikeftek, serpêhatiyeke wê heye. Nola negotî, bila zimanek têketa devê wan û wan bixwe serpêhatiya xwe bigota.

Li jêra kelê, li hêla başûr-rojhilatê kelê, kevirekî mezin û qul heye. Dîyar e ku ev kevirê dengê ye. Ango yê dahn hêrandin, çiltûk/birinc-spîkirin û zeytûn-eciqandinê ye. Li newala rojhilatê kelê du kanîyên bi navê kaniya Kimdaw û kaniya Zelx, ber bi gundê Fitnê diherikin. Li hêla rojava jî du kanî yên bi navê Şurruka Rebetê û kaniya Dêrwîn hene. Şurruka Rebetê, ji bin kelê diherike û xwe berdide ser gundê Rebetê, kaniya Dêrwîn jî ber bi gundê Tahlbeşê ve diherike.

Kela Rebetê, 15 km bi riya erebê û bi fira çûkê jî 7-8 km dikeve bakûr-rojavayê Dêrikê.